


Kurmanciya Berferêt



CLAUDIO POLESSEL/ITALYA



"Ji qewmê pezkoviyan re xew heram e"
Rênas Jiyar

WIENE: VEDAT ASLAN



WIENE: FATHER THEODOR

Li Diyarbekirê gava zarok teştê nanê ji firnê tînin...

Kengî û çawa berê xwe dan Tirkî?

Zincîreyên çiyayên Binboga-Nurhaq-Engîzek ku dikeve nav herêma Antîtorosan (Navtorosan) di nav çand û hunera Kurdên Elewî de cihêki xwe yê taybet heye.

(Di zimanê Ewropîyan de ji bo van deveran Antî Toros yan jî Navtorosan dibêjin. Ez bi xwe peyva Navtorosan tercîh dikim) Li ser vê yekê mirov dikare bêje, ger gewdeya kultura Kurd-Elewî a Antîtorosan Mereş be, şaxên wê yên esas jî Sêwas, Meletî û bi rêya Şah Hatayî, Nesîmî û Fuzulî heta digihîje erdên Mezopotamyayê. Elewîyên li Mereş û li derûdora wê hema bêje bi temamî Kurd in. Loma ji li wir bargiranên kultura Elewîtiyê yên mîna pîr, şêx, aşîq, bab giş Kurd in. Ev derên hanê jî Selçûqîyan heta Osmanîyan bûne şahidê gelek serhildan, komkuji, û meseleyên civakî. Heta wextekê mîletên wir di nav xwe de bi Kurdî qîse dikirin, û di ayîn û rûrûsmên Elewîtiyê de jî li gel Kurdî carna ayet û beytên bi Tirkî jî digotin, bes miqam dîsa yên Kurdî bûn. Hebûna Kurdî di kultura Elewîtiyê de bi serê xwe reng û zengîniya ziman û edebiyata Kurdî bû. Lê piştî wextekê, Kurdî şikestek xwar û pêre pêre Tirkî belav bû di rûrûsmên wan de,

heta mirov dikare bêje gelek gulbang, beyt û ayetên Kurdî wenda bûn, çûn. Lê helbet sebebên wan hene, em ê niha bi kurt û kurmancî berê xwe bidin wan.

Tirkkirina Kurdên Elewî jî Tevgera İttihad û Teraqqiyê heta Kemalîstan, her dewam kir. Jixwe, di dema Kemalîstan de ev bû plana sereke a dewletê. Her wiha kadroyên İttihadê xwestin wekî İslama-Tirk, Bektaşîti bikin dewsa Elewîtiyê, ji ber zimanê îbadetê ya Bektaşîyan bi Tirkî û bi vî rengî jî wê Tirkî di nav Kurdên Elewî de bi pêş biketa. Divê mirov vê jî bêje, gava Komara Tirk ji ava bû, Elewî bi hêviyêke nû xwe bi hikûmeta komarê ve girê dan, û ji bo ku xwe bi wan şîrîn bikin û jî îlegalîteyê derkevin, legal û resmî bibin, zûka berê xwe dan îbadeta bi zimanê Tirkî.

Her wiha em siyaseta bidin aliyekî, hebekî jî normal bû, ji ber ku Elewî baweriya xwe bi mirovhezîyê tine û pê re jî ji kulturên din re jî hurmetkar e. Loma ji xerabî nedîtin gava ayetên bi Tirkî yên ji hêla hozanên Tirk, Kurd an jî mîletêki din, dihatin gotin, di merasîmên xwe de bixwînin. Ji kîjan mîletî dibe bila bibe, Elewîyek dikare deyiş, nefes û zêmaren bi Tirkî jî bibêje. Ma ne Şah Hatayî, Seyîd Nesîmî, Fuzulî ku bi eslê xwe Kurd bûn lê bi Tirkî berhem ji dane, dîsa jî mêze nakin bê ka Pîr Sultan Evdal, Kul Hîmmet, Vîranî û Yemîni bi eslê xwe ji kîjan mîletî yan qewmî ne. Ev navên ku me jimartin jî her heft hozanên mezin ên Elewîtiyê ne.

Li Ewropayê xwe elimandin xwendin û nivîsandina Kurdî

Kurdên li mintîqa Bînbogalarê ku ez jî lê mezin bûme, hema hema bi temamî Elewî ne. Bi taybetî jî di dema Komarê de yên ku bi Tirkî deyişên Elewîyan nivîsandine hema hema giş Kurd in, Melulî, Mucrîmî, Perîşan Guzel, İbretî, Fedai, Hudayî, Meç-



Kurdên li Navtorosan.
Sûret sala 1906'ê an jî 1907'ê
ji alî Hugo Grothe ve hatiye girîtin.

Hedefa polîtîkayên Komarê ew bû ku di serî de cihên mîna Dêrsim/Sêwas/Meletî deverên ku xelkê Kurd-Elewî lê ne, bike Tirk. Bi van polîtîkayên Komarê re, xelkê hin cihan bûn Tirk, hin cihên din jî di karûbarên hunerî de dêhn û meyla wan çû ser Tirkî ku dewletê jixwe çî veşartî çî eşkere Tirkî teşwîq û şîrîn dikir.

hulî, Mahzûnî, Nesîmî, Emekçî, Temelî, Vîcdanî, İsmail İpek, Nurşanî, Turabî, Meftunî, Mecalî, Ahmet Guven, Alî Balî, Yetimî hin jî wan kesên navsere ne. Ev hozanên hanê, bi Kurdî difikirîn û bi Tirkî dinivîsandin. Bi alfabe ya Kurdî nedizanîn, loma jî nedikarîn bi Kurdî binivîsin. Çend jî wan piştî ku berê xwe dan xerîbiyê yanî li Ewropayê xwe elimandin xwendin û nivîsandina Kurdî û bi vî rengî bi Kurdî jî berhem dan.

Gava behs bû asimilasyon û komara Tirk, divê teqez mirov behsa Pîlana İslahkirina Şerqê (Şark İslahat Planı) bike. Ka hema em tenê li xala 17'an a Pîlana İslahkirina Şerqê mêze bikin:

"Divê li hin bajarên li rojavayê Ferêt zimanê Kurdî li Kurdên ku li hin herêman belav bûne, miheqeq bê qedexekirin, û divê giringî di dibistanên keçan bê dayîn û mecala xebardana wan bi zimanê Tirkî bê çêkirin."

Li rojavayê Ferêt kî hene? Bêhtir Kurdên Elewî ne. Armanca wan çî ye? Asimilasyon û Tirkkirina Kurdên Elewî. Ew pîlan 1926'an kete meriyetê, bes bela ku Kurdan li pey hev şerê rejîma Kemalîst kir, bi temamî bi ser neket. Bes piştî têkbirina şerê Kurdan, hikûmeta Kemalîst di sala 1930'î de ji hêla Wezaretê Karên Hundir ve "Genelge"yekê (fermannameyekê) dişîne.

Di xalên vê "fermannameyê piir girîng û veşartî" de ku li gorî Pîlana İslahkirina Şerqê hatibû hazîrkirin, û ji rêveberiyên bajarên re hatibû şandin, ne tenê behsa qedekirina ziman dihat kirin, ji stranên heta bi dawet û cilûbergên Kurdan, behsa qedexeyên her cure detay û hesabên kulturî hebûn.

Hedefa polîtîkayên Komarê ew bû ku di serî de cihên mîna Dêrsim/Sêwas/Meletî deverên ku xelkê Kurd-Elewî lê ne, bikin Tirk. Bi van polîtîkayên Komarê re xelkê hin cihan bûn Tirk, hin cihên din jî di karûbarên hunerî de dêhn û meyla wan çû ser Tirkî ku dewletê jixwe çî veşartî çî eşkere Tirkî teşwîq û şîrîn dikir. Ha di vê meselê de, du dewrên girîng hene ku yek jê jixwe zor û zexta hikûmeta Kemalîstan bû, ya din jî ew bû ku piştî salên 1950'î koçkirina ber bi bajarên ve û pê re jî piştî salên darbeya 1960'î bi pîlan û qest xwestin Tirkî belav bikin û wejeyê jî bikin "Tirk" Wê yekê jî kir ku di nav Kurdên xwendê û nivîskar de û pê re jî di nav hozanên Kurdan de Tirkî belav bibe; jixwe hingî jî perwerdeya bi Kurdî qedexa bû. Her wiha ger mirov bêje hingî hereketên sosyalîst ji bo strandîna bi Tirkî bûn palpişt, ez dibêim qey wê ne şaş be.

Ev jî heye, hozanên Kurd û Elewî, erê di mala xwe de bi Kurdî xeber didan û bi Kurdî difikirîn, bes haya wan jî zimanê nivîskî yê Kurdî tinebû, vê jî dikir ku berhemên xwe bi Tirkî biafirînin. Hinek jî wan di mekteban de bi Tirkî perwerde bûbûn, bes wan jî bi Kurdiya nivîskî nedizanî. Em jî dizanin hin dengên Kurdî hene ku di alfabe ya Tirkî de tinene, wekî; î, ê, w, q, x, xwe. Heger hozanekî/ Kurdî bifikire û nizanibe alfabe û nivîsa Kurdî, ew ê çawa karibe bi Kurdî binivîse? Loma jî gelek gulbang, lawîj, beyt û ayetên Kurdî jî ber ku nehatin nivîsandin, ji bir çûn. Herçî bapîrê min Haydar Bayrak bû, em bêjin 20 beyt û ayet digotin, lê kurê wî Hacî Bayrak karîbû encax ji wan 10 beyt û ayet bigotana. Lê divê em wê jî bêjin, erê niha kilam û beytên hinekan êdi bi Tirkî ne, bes nihurandina wan Kurd û Elewî ye.

Helbestvaneke jin: Fîdan Çolak

Fîdan Çolak 1961'ê li Elbîstanê tê dinê. Hê 16 salî ye, wê dizewicînin, niha li Fransayê dimîne. Ji sala 2006'an û vir ve helbestan dinivîsîne. Ew împrovîze (ji ber xwe ve) dinivîse, heta niha du pirtûkên wê çap bûne. Çend helbestên wê yên bi Kurdî jî hene, piştî ku bihîstîye ez qîmet didim helbestên Kurdî û di kitêbên xwe de cih didime wan, helbestên xwe nişanî min jî kirin.

*Du çavên min bûna kanî
Dostê ava xwa hilanî
Falak tu ma rahat barda
Ma mirazê xwe hilnanî*

*Azê êl bi êl dagarim
Nizanim ku az kuva tarim
Falak tu ma rahat barda
Azê ja ve êlê harim*

Helbestvaniya bi Kurmancî: Alî Matur (Maksudî)


Maksudî jî li Ewropayê dimîne, bi Kurdî gelek helbestên wî hene. Yek jî wan li ser Qetlîama Mereşê ye. Divê mirov bêje, li ser Qetlîama Mereşê gelek



ALİ MATUR



ŞAH SULTAN



AŞIQ TEMELÎ



FİDAN ÇOLAK

kesan şîn girtiyê û li ser vê şînê jî bi Kurdî helbest nivisîna û stran gotine. Hinek ji wan kesan ew in, Alî Işçimen, Alî Matur, Şah Sultan, Aşiq Turabî, Ozan Vîcdanî, Zaferî (Ahmed Dillice), Zeynel Oztaş. Çend rist ji helbesta Alî Matur li jêr in:

*Maraş na destpêka ne ji dawî ye
Êdî ji xavê rabin dost dujmin kî ye
Lîstik û xapandin nabin hevî ye
Kuştin wan bi sadan can la Maraşê*

Dengbêjekî bi navûdeng: Hasanî Tosin

Piştî şeş salan li xeribiyê, ji bo ketine pey şopa Fatareş û berhevkirina muzîkê, piştî cih û warên kalikên xwe yanî Dêrsimê, min berê xwe da Mergê (Bi Tirkî Gokçayir) ku li quntara Çiyayên Engîzêkê ye. Min li wir dengên hin dengbêjan qeydî kasêtan kirin. Paşê ku hin pê hesiyane ez muzîkan berhev dikim, qala dengbêjê binavûdeng ê vî herêmi Hasanî Tosin ji min re kirin. Navê wî dengbêjî nivok min berê bi-histibû, li Elmanyayê bi rêya merivên wî min hin kasêt û videoyên wî peyde kiribûn. Hingî jî min fêhm kiribû ku ew deng dengêki were bû ku li gel dengbêjiya xwe muzîk û helbest jî li hev dianîn. Mirov dikare ji bo Hasanî Tosin bêje, dengbêjê dawî yê klasîk ê Antîtorosan bû. Wî emrê xwe di navbera salên 1918-2007 an de li gundê Bazarçixê Salmanpakê bihurand. Ew 8 salî bi nexweşiyekê dikeve ku çavên wî nebaş dibin, ji ber bêmecaliyê jî nayê dermankirin, loma jî çavên wî jî sedî 80 nedidîtin. Di 10 saliya xwe de tesîra dengbêjekî gerok li ser çêdibe û hêdî hêdî dilê wî li dengbêjiyê germ dibê. Hingî dielime lîxistina sazê jî. Carna bê saz, carna jî bi saz dest bi dengbêjiyê dike. Li gel meseleyên meheli û herêmi, destanên naskirî yên Kurdan ên wekî Memê Alan, Siyabend û Xecê jî ber dike, gund bi gund digere û çirok û kilamên xwe dibêje.

Ez ê behsa biranîna xwe jî li vir bikim. Berê min di rojnemaya Ozgur Politika de nivisîbû ku tîkiliya xwe bi Hasanî Tosin re heye. Gava min bihist du personelên Wezareta Çand a Tirkiyeyê çûne Antîtorosan û li wir 6 seatan dengê Hasanî Tosinê qeydî kasêtê kirine ku tê de destan û kilamên Kurdî hebûn, min xwest xwe bigihînim vê kasêtê. Min Mudirê Giştî yê HAGEM ê, Seyhan Livanelioğlu dit û jê kopiyekê ve kasêtê xwest. Pîrî Er ê ku berhevkarê folklorê Kurdî bû li gel mudir Seyhan Livanelioğlu bû, wî jî min re got, "Me ev qeyd anî lê ji bo arşivkirina wan îzna Wezîrê gerek bû. Me jî bo îznê jî Wezîrî İsmail Kahraman pirs kir, (İsmail Kahraman hingî Wezîrê Çandê bû û di salên 2015-2018 an de jî Serokê Meclîsa Tirkiyeyê bû), wî jî me re got, derhal wana îmha bikin. Me got wekî dezgeh karê me ew e ku em wan berhev

bikin, wî jî got, nexwe têxin arşivê bes nedin ti kesî." Piştî behskirina vê meselê wî gote min, loma em nikarin bidin te. Bira jî nedan min, ez jî nizanîm çî bi serê wê kasêtê hat.

Li Ewrûpayê berê xwe da Kurdî: Aşiq Temelî

Sala 1948'an li gundê Dallikavak ê Sarizê ku Sariz jî bi ser Kayseriyê ye, hatiye dinê. Di civata kalê xwe Haydarê Gir de (Haydar Bayrak) hê biçûk e, dielime li sazê bide û deyiş û ayetan bêje. Sala 1973'yan diçe Elmanyayê û li wir bêhtir berê xwe dide Kurdî. Kasêta wî ya duyemîn, 'Hozanê Şoreşgerî Demokrat' 1976 an derket ku temama wê bi Kurdî bû. Ew

kasêta wî belkî yek ji wan kasêtan e ku pêşî li Ewrûpayê bi Kurdî hatiye belavkirin. Pê re jî dest bi nivîsandina şîrên Kurdî dike. Ji gelek kovar û rojnemayan re dinivîse. Piştî çend kitêbên xwe yên bi Tirkî, ve carê bi Kurdî kitêban derdixe. 'Namirim' (1998) û 'Zimanê Me Derûna Me' (2009), 'Kurdiya Me Rih û Riçikên Me' (2009) derdixe ku şîrên wî yên bi Kurdî tê de hene. Her wiha kitêba wî Hesreta Sed Salan-Yüz Yılların Hareti' jî bi Kurdî û Tirkî ye.

Em ê di vir de cihê bidin çend ristên helbesta wî 'Jiyîn mafê te ye':

*Jiyîn mafê te ye, dinya xwe çêke
Bona jiyîna xwe giştî bi rêke
Serê xwe xwar neke, enya xwe rake
Gazî ke, hewar ke, dengê xwe mebir.*

*Dijminên me pir zalimin, dizanîm
Fêl û fikra wan li wan dixwînim
Pêwîst elî qewlê xwe wan bigihînim
Bi gernasî xwe berev ke û megir.*

*Berhelîst ray pêde ba lê xîş bi poz
Bila bê zanîn bê dawî ye hêz, doz
Lawên mêrxasan e tim û tim bi berz
Bimînin tu carna xuy xwe meguher.*

Ozanvaniya bi temamî Kurmancî: Ozan Şah Sultan

Ozan Şah Sultan bi eslê xwe jî gundê Nargele yê Elbistanê ye. Heta niha 250 kilamên Kurmancî çêkirine. Sala 2011'an li Berlînê diwana wî ya 654 rûpelan çap bû ku hema hema nivê wê bi Kurmancî bû. Bi qaşî em dizanin, heta niha 6 albumên wî yên muzîkê belav bûne. Bi Kurmancî helbesta xwe ya yekemîn di sala 1973 yan de nivîsand. Ez jî jî ve salê û vir ve wî nas dikim.

Min jî nîfşên berê, navsere û ciwan jî di nav de gelek hozanên ji Antîtorosan nas kirin. Wana li gel Kurdî bi Tirkî jî berhem didan. Lê ferqa Şah Sultan ew e ku hema bêje tenê bi Kurdî kilam gotine, ew jî hêjayî qalkirine ye. Mesele û qewmînen li herême bi zar û awazên xwe digotin û kilamên wî digotin jî bi pirranî eydê wî bûn.

Mijarên kilam û helbestên Şah Sultan ev in: Xerîbî, Elewîtî, dil, eşên de û bavan, biranin, tekoşin û aşitî...

Li wir em dikarin bi çend ristan helbesteke wî li ser evîn û eşqiyatîyê neqil bikin:

*Azê tim la çiyakî bim
La yayle wa giyakî bim
Savê xatirê ta rinde
Azê ba eşqiyakî bim...*

* Ev gotar jî hêla İbrahim Bulak ve jî nivîsên Mehmet Bayrak hatine berhevkirin û tercumekirin.



HASANÎ TOSIN

Mirov dikare ji bo Hasanî Tosin bêje, dengbêjê dawî yê klasîk ê Antîtorosan bû. Wî emrê xwe di navbera salên 1918-2007'an de li gundê Bazarçixê Salmanpakê bihurand. 8 salî ew bi nexweşiyekê dikeve ku çavên wî nebaş dibin, ji ber bêmecaliyê jî nayê dermankirin loma jî çavên wî jî sedî 80 nedidîtin.

Li ser devoka Mereşê

► Meftun ATAKAN

Li ser devoka Kurdiya Mereşê carna tiştên nerrind dibên. Heta car caran pê dikenin û li ser vevê henekan dikin, ji xwe re pêkenokan çêdikin. Devoka ku di vevê nivîsê de ez ê jê re bêjim "devoka Mereşê", ne ew devok e ku tenê kesên ji Mereşê pê deng dikin, kesên bi vevê devokê deng dikin li coxrafayeye hin firehtir belav in.

Hinek cûdatî di navbera wan de hebin ji li gelek bajarên Kurd lê ne, ev devok tê çîsekirin. Ka em li van mêze bikin. Li Rojavaya Kurdistanê Efrîn, li Bakur Dîlok, Qirixan, hemû navçeyên Mereşê (pirraniya van Bazarçix-Markaz, Albistan û Nûrheq), her derê Meletî, Semsûr, li rohilata Ruhayê, Kayserî (Sariz û Pinarbaşî), li navçeyên başûrê Sêwazê, li Elazizê navçeyên Baskil û Kebanê, hin gundên Pertag, Çemişgezek û Xozatê, Kurdên Enqerê, Qonya û Qirşarê hetanî Xorasanê ji xelkê ku bi devoka Mereşê deng dikin, henin. Ku mirov bi çavê objektîf li van bajaran binêre dê bibîne ku ger mirov bêje, "devoka Mereşê" lê rûnanê. Divê em bona vevê navekî din binînin. A rast, Ehmedê Xanî di berhema xwe ya pîroz Mem û Zînê de Kurdiya van herêman bi nav kiriyê jixwe;

*Bohtî û Mehmedî û Silivî
Hin lal û hinik ji zêr û zivî*

Ev sê devok ji devokên zaravayên Kurmancî ne. Kurdên Mereşê ji jî şaxekî şeweya Mehmedî ne.

Rexneya bi Tirkî nivîsandinê

Tiştêkî din ji heye, hema ger behs bibe Kurdên Mereşê, di cih de rexneya, Kurdên Mereşê hemû bişavî ne û ti berhemên Kurdî nedane, tê kirin. Herê, heta derekê ew rexneyên hanê rast in. Ji Mereşê wêjevanên ku bi Kurdî dinivîsin pîrr hindik in. Nivîskar û lêkolînerên Mereşê pîrranî nivîs û lêkolînên xwe bi Tirkî dinivîsin. Lêkolînan Mehmet Bayrak (ew li Sarizê hatiye dinê, lê eslê wan ji Mereşê ye û ji Goçyaran çuyina Sarizê) yek ji wan kesan e. Mehmet Bayrak li ser Kurdolojîyê gelek berhem dane, pêşkeşî xwendevanan kiriyê. Ne bi tenê xwendevanan, boyî dîroknas û kesên ku bi zargotina Kurdên Elewî re elaqedar in ji berhemên Mehmet Bayrak çavkaniyên baş in. Herçî berhemên wî yê bi Tirkî ne jî, bi ya min divê mirov wan giş wergerîne Kurdî. Bi vî rengî jî ew berhem bibin himên pirtûkxaneyê zimanê Kurdî.

Ji Meraşê Xeberek Hat

Ger ez ne şax bim, sala 2003 yan bû, ez rastî kîtêba li "Ji Meraşê Xeberek Hat" hatim. Ev pirtûk ji Weşanxaneyê Pêrî derketibû. Ji hêla Alî Alxasî ve hatibû nivîsandin. Kitêb bi çend bûyerên ji hêla Mereşê û Meletî dest pê dikir (wekî Qirixirina Mereşê, Çiroka Meyrikê, Qasimoxlu Mamadolî û wekî din) û bi kurtejiyanên hozanên vevê herêmê jî tê de, û bi şorên kîlamên van dewam dikir. Min cara yekem xwe di kîtêbeke de didit, û seba vevê jî ez him heznî bûbûm, him ji kelecani. Berhevkarê me bi armanca folklorîk, ev kîtêb pêşkeşî me kiribû. Lê meriv bi çavê objektîf li pirtûkê mêze bike, esas kêmasiyên pirtûkê hebûn. Bi ya min heke berhevkarê dixwaze xebateke folklorîk derine holê, divê jî zimanê herêmê vevê

neqete. Çira? Pêwîst e, piştî salên dûr û dirêj, ger zimanzanek an jî zargotinzanek rojekê niyet bike li ser Kurdiya Mereşê kar bike, û li vevê pirtûkê mêze bike, divê bêje "Himm nexwe Kurdên Mereşê wisa diaxivîn". Ku wer nebe ew xebat nabe xebateke folklorîk.

Bo mînak: Hevoka 'Ez diçim' li Mereşê dibe 'Azî/ê tarim'. Lê berhevkarê me li berhevoka xwe de 'Azî/ê tarim' kiriyê 'Ezî terim'. Li ser vevê meseleyê ez ê zêde dirêj nekim. Dîsa jî ez nabêjim xebateke nexweş e. Eşkere ye ku bona vevê gelek ked daye. Jixwe berhemên bi vî rengî bi kedêke mezin tene der. Lê bona devokên ku mîna Kurdiya Mereşê û devokên ku dîrî ji Kurdiya nivîskî ya berbelav e, xebatên folklorîk pîrr girîng in.

Taw Dilo

Berhevokeke din ji bi navê 'Taw Dilo' çap bû. Ev berhevok ji hêla Weşanên Enstîtuya Kurdiya Stenbolê ve hate weşandin. Bi ya min ev berhem berhe-me bêhempa ye. Berhevkarê vevê carê Mehmet Komur e.

Tiştên ku me li jor qala wan kir, em nikarin derbarê Taw Dilo de bêjin. Taw Dilo ji wek xebateke folklorîk çap bûye. Pirtûk bi pêşgotina birêz Mazlûm Doxan dest pê dibe. Ew bixwe jî ji Albistanê ye û di pêşgotina xwe de ji me re derbarê devoka Mereşê de gellek tiştên girîng dibêje. Li ser taybetmendî û cudatîya devoka Mereşê gelek nimûneyên balkêş dide. Van nimûneyan jî ne li gora rê û rêbazên zimanê nivîskî, li gora bilêvkirina wê axzê (hêl, alî) dide berçavan. Peyv ji devê insanên wê derê çitoli hatine der, werga hatine nivîsandin.

Kitêb bi gotinên pêşyan, dewam dibe. Û bi biwêj, nîfir, metelok, navnûtik û hejmarokan bi dawî dibe. Taw Dilo kîtêbeke werga ye ku herçî dixwaze li ser devoka Mereşê lêkolînan bike an jî meroq dibe, gerez ew pirtûk li cemê jî hebe.


Dengê Bavê Min

Wexta ku mirov behsa berhemên dibe, siftê tiştên nivîskî yanê pirtûkên tîna bira me. Lê sînemaya jî di qada hunerê de cihêkî xwe yê girîng heye. Dibe ku we nebihîstîye, lê Mereşiyên bi Kurdî sînemaya jî çêkiriyê. Heta ji destpêkê heta dawî bi Kurdiya Mereşê film çêkirine. Bi ya min ev film pîrr bi qîmet bû. Çima? Berî her tiştî bi Kurdî bû. Hem jî bi Kurdiya ku her kesî pê tinazê xwe dikir.


Dengê Bavê Min ji aliyê derhêner Orhan Eskikoy û Zeynel Doxan ve hatiye çêkirin, di sala 2012 an de. Film qala malbatekê dibe ku ji qirixirina Mereşê xelas bûye û gelek tesîr li wan bûye. Me behsa ziman kir, lê film tenê bi Kurdî ye û serketî ye, hem di warê listikvanan de hem jî di hûnandina mijarê de gelekî serketî ye. Ka hûn jî lê temaşe bikin! Hingî hûn ê bibinin, tiştên min gotî rast in yan na.

Şûna gotina dawiyê

Wek gotina dawî ez dibêim devoka Mereşê zêrê zer e. Kî çî dibêje bera bibêje, berhemên wiha wêrekiya me zêde dikin û kesên ku dixwazin bi devoka xwe tiştan çêkin, rîya wan vedikin. Herkes êş û elema xwe encax dikare bi zimanê ku jî diya xwe bihîstîye, şirove bike. Ez jî standardkirina zimên re tiştêkî nabêjim. Bawer nakim ku kesekî jî rexneyê li vî



tiştî bigire. Lê belê, heger kesekî/ê xwe li nava tiştêkî/ê nebîne jê sar dibe û jê dîrdikeve. Mesela TV 10 jî mîna keke rind bû. Her cara ku ez diçûme malê, diya min li bernameya TV 10'ê temaşe dikir. Her çîqas televizyonên din ji hebûna, diya min xwe di van televizyonan de nedidit. Bi vevê kanelê re bawerîya xwe bi zimanê xwe anî. Berê bi min re bi Tirkî deng dikir. Vêsta jî bi neviyên xwe re bi Kurdî. Divê em berê, bi Kurdiya xwe ve li hev werin.



● Di wê kitêbê de aliyekî balkêş agahî ji bin, aliyê bi rastî jî xasî kitêbê sentezek bû: Senteza zarê Berferêrê û Kurmanciya ji bo nivîsê êdî belav weke standard dihat bikaranîn.

● Tiştê gramerê ya ku ji serî heta binî reng û dirûvê zarê Berferêrê dide zimanê kitêbê, tewanga nêr a navên di wan de "a" û "e" heyt ye.

Di navbera Berferêrê û Kurmanciya nivîsê de konsensusek

► Luqman GULDIVÊ

Pir Ali Balî gava sala 2005'an bi navê Diwan-a Heq bi Kurmancî Cêmê Elewîtiyê kitêba xwe derxist*, li ser cem, gulbang û nefesên cemên Elewîyên Kurmancî kêm tişt dihatin zanîn. Di wê kitêbê de aliyekî balkêş agahî jî bin, aliyê bi rastî jî xasî kitêbê sentezek bû: Sentez, belkî konsensusa zarê Berferêrê û Kurmanciya ji bo nivîsê êdî belav weke standard dihat bikaranîn. Min sala 2014'an meqaleyek ji bo kitêbeke li ser diyanetên Kurdistanê, xasma ji bo rexnekirina oriyantalîsta Fransîvîs Irène Mélikoff ev kitêba hanê jî xwe re kire mijar** û bersiv da pîrsa vê oriyantalîsta hanê ya weke, "De ka véca em lê binihêrin, Elewî heta bi ku di karin xwe li Kurdbûnê daynin" (1998, p. 264)***.

Helbet li vir bersiva pîrsê ne bi maneya Elewî Kurd in yan na Kurd in, lê awira oriyantalîsta a ku xwe di ser mijarê û di ser tiştêyên mijara lêkolînê re jî digire û xwe dixê xûna Xwedê; yanî bêyî ku civakê û xwe terifikirina wê, nasnameyên wê bibîne, li gorî qalibên derveyî wê civakê, nasnameyêke din bi rengê destwerdaneke li dirûvgirtina nasnameya wê civakê çêdike û heta mirov dikare bibêje li ser ferzê dike. Axir Kurmanciya Diwana Heq û Kurmanciya gulbang û nefesên tê de bi hêsani ev teza hanê pûç dikir. Beriya wî sala 1992'yê jî bi Kirmanckî Duzgun, Comerd û Torinêcengî gelek dua, gulbang û nefes weşandibûn, Arî Mezin jî sala 2001'ê bi heman zarê Berferêrê û heta yê heman devera Pir Ali Balî di kitêba xwe de cih dabû gelek dua û peyvên dema rîtuêlan ên Elewîyên Kurmancî****. Lê Pir Ali Balî bi awayê muntezam ji serî heta binî cemên Elewîyên Kurmancî bi zimanê wan vedigot. Heta ew rakirinajiholê ya çê û xirab li cem Xwedê, ya ku bi ya min bi kêm delîl û muhtemelen bi şaşî weke reformeke Zerdestî tê binavkirin a Zurvan, xwe di gulbangên wî de dida der: Wî peyva "ocaxî Zervan" (rr. 51, 61, 75, 79) û "nûrê Zervan" (r. 55) bi kar danî û eynî ew Zurvanê di dema Sasaniyan de navê wî hatiye hildan û nivîsandin. Di Kurmanciya îro de hîna ev nav weke zeman û dem di nava xelkê de heye, lê kêm kes bir dibin ku zeman weke têgeheke Xwedayê her tiştî, bêyî du-bendiyêke çê û xirab hatiye sêwirandin.

Ezafê ya Berferêrê

Lê îro ez ê berê awirê xwe bidim Kurmanciya ku bi ya min hem di ware peyvên û fonolojîyê de hem jî di ware gramerê de konsensusek e. Helbet tenê bi çend mînakên û ne kite bi kite. Em ji destpêkê ve forma ezafê ya tê de nêr û mê ne li gorî Kurmanciya belav e, dibînin. Di beşa "Derî, Rêber û Ketinê Rêyê" (r.7) de hê di sernivîsa beşê de em vê dibînin û ku di nava zarê Berferêrê de belav e. Di Kurmanciya belav de mesderên lêkeran mê ne û di ezafeyêke de weke "ketina rê(yê)" tên bicihkirin. Hevoka pêşî ya beşê bi heman rengî dewam dike: "Înakirinê (bawerkirin) Elewî bi misahibiyê dimeşe." Yanî ev forma ezafê li vir ne carekê, lê bi awayekî sistematîk hatiye bikaranîn. Ji bo çêtir fêmkirina meselê em li ezafeyên bi navdêran nêr binihêrin. Di beşa "Nefesê Êşîkê Malê Cemê" de dibêje, "Oçaxî mirazan, nûrê ronî" (r.14). Em bi rehetî dibînin ku li vir ocax nêr hatiye dîtîn û nûr jî mê, lê ne weke Kurmanciya belava bi rengê "ocaxî mirazan, nûra ronî". Pîraniya Gulbang û nefesan bi gotina, "bi navî heq" dest pê dikin (weke nimûne binihêre li r.64 û r.65) û "nave heq" nehatiye gotin.

Lê nivîskar weke di serî de jî min behsa wê kir, sentezekê dike. Em di seranserê kitêbê de kesandina dema niha ya lêkeran li gorî Kurmanciya standarta a belav dibînin. Ji bilî "dimeşe" ya li jor û li destpêka kitêbê, di nava gulbangan bi xwe de jî nivîskar ev senteza hanê û belkî konsensusa hanê kiriyê û kesandina lêkeran ne bi bilêvkirina zarê Berferêrê kiriyê. Di beşa "Nefesê Êtê (Dak, Dayik) Post" de murîş dibêje, "Me destûrê xwe jî nefesê Heq hilanî, em dixazin ji canên kamil pîrsê pîrskin û ji wan jî nefesê Heq bibîzin." (r.77) Li vir "dixazin" eşkere xwe digihîne "dixwazim" û forma mirov li bendê ya weke daexazim***** jî nehatiye bikaranîn. Ev konsensûsan hanê jî bo kesandina lêkeran bi gîştî kêm û zêde mirov dibîne.

Deng û kesandin di navbera Xelîl û Celîl de ne

Di ware fonetîkê de jî bilî dengê "ae" dengê "a" ya dirêj ku di Kurmanciya belav de weke "a" ya bi elîfa Erebbî ye, lê di Kurmanciya Berferêrê de "a" yeke dirêj e ku di destpêka wê de lêv li tipên glover yanî o,w,u vekirî ye. Ez dikarim li vir weke "oa" wê binivîsim. Pîraniya nivîskarên ew nivîsandine, ew weke "o" nivî-

sandine. Helbet mirov bi rehetî dikare bifikire ku kesek dikare "Li cemê Elewîyan, avê Seqe pîr pîroz û miqedes e" (r.65) weke "Lae caemê Oalewîyan, oavê Saeqe pîr pîroz û miqaedes ae" bixwîne. Lê hînge jî "a" ya dirêj ku di wî zarî de her wiha heye, wê çawa bê xwendin? Yan jî jî vê ya din çawa bê derxistin? Ew meseleyek e. Li aliyê din em dibînin ku ew bi heman rengî fonolojiya zarê Berferêrê jî tercîh dike; çawa ew di rûpel 22 de dibêje, "Pîrî Balî bi neçarî/Berx bû qurban, beran kalî/Li bangê me were Elî/ Derdo derdo vê dermano." Wî her wiha dikarî bibêje "bê dermano" lê forma Berferêrê "vê dermano" tercîh kiriyê.

Tiştê gramerê ya ku ji serî heta binî reng û dirûvê zarê Berferêrê dide zimanê kitêbê, tewanga nêr a navên di wan de "a" û "e" heyt ye. Di beşa "Nefesê ber Post" de dinivîse, "Mirazî dilan, nefesên ku bèn (werin) zimên, bi destûrê Xwedê heq bin." (r.40). Di beşa "Nefesê Semê" de jî dinivîse, "Navberê erd û ezmên çerx bû bi hejinê semê..." (r.46).

Helbet aliyê herî zêde jî ava zarê Berferêrê vexwarî peyv û gotin in, em jî minaka li jor karin berê xwe bidin "çerx bûnê". Wekî din peyva "bina" (bi maneya bila, bera) jî serî heta binî di kitêbê de hatiye bikaranîn. Em wekî din lêkera "nazbûnê" (weke nimûne r. 27), peyva "carî sifê" (weke nimûne r. 39) yan jî bilêvkirinê taybet ên weke "rêxistin" (bi maneya raxistin, weke nimûne r. 71) dibînin ku îşaret bi zimanê Berferêrê dike. Di dawiyê de tevî ku li gelek deveran ew hisa, wergereke wê keliyê ya Pîr bi xwe diyar be jî, em di nivîs û zimên de konsensuseke (lewma dibe ku sentez helemanek be) di navbera aliyê Kurmanciya Berferêrê û Kurmanciya di nivîsê de belav bi rehetî dibînin, ku weke nimûne Arî Mezin tercîh nekiriyê.

* Balî, Pir Ali. Diwan-a Heq: Bi Kurmancî Cêmê Elewîtiyê, Düsseldorf: Yol erkan Yayınları, 2005.

** Turgut, Lokman. "An Inside View of the Kurdish Alevis: Diwana Heq of Pir Ali Balî," in Omarkhalî, Khanna (ed.), Religious Minorities in Kurdistan: Beyond the Mainstream. Series: Studies in Oriental Religions, vol. 68. Harrassowitz, Wiesbaden, 2014, rr. 159-172.

*** Mélikoff, Irène. Hadji Bektach, un mythe et ses avatars, Leiden, Boston, Köln: Brill, 1998.

**** Arî Mezin. Kurdên Elewî di dorpêça agir de, Ateş Çemberindeki Kizilbaş Kürtler, 2001.

Düzgün, Mustafa; Comerd, Munzir û Torîcengî, Hawar. Dêrsim de diwayî, qesê pi - kalikan, erf u mecazi cibenokî, xelataneyî, Ankara: Berhem, 1992.

***** Ez "a" ya kurt jî bo jihevderxistina jî "a" ya dirêj (a bi elîfa Erebbî), weke "ae" li vir dinivîsim. Pîraniya nivîskarên wê, "e" yan jî "a" jî bo nivîsandina wê bi kar tinin.

Devok û zimanê dibistanê

Her ziman bi devokên xwe dewlemend dibe. Ji ber ku her devok li gorî xwe gotin, biwêj, tiştanok, kilam, lorî, şîn û gotinên pêşyan diafirîne. Kengî dewlemendiya devokan dikeve nav zimanê nivîsê, wê çaxê zimanê dayikê dibe okyanûs.

Devok di her zimanî de hene. Wek mînak: Elmanya dewlet e. Bi tîrî xwe zanîngehên xwe hene. Lê bi devokên xwe navdar e. Ango ti hez nikare devokan ji holê rake. Ew rastiya xwezaya mirov e. Gelek devokên Elmanî hene, gelek jê ji ne devok in, ziman in û hin jê jî şewezar in. Lê gava bi Elmanî xelkên van şewezar û zimanan dipeyivin, êdî ew jî dibe devokeke taybet. Ji ber wê zimanê Plattdeutsch hebe jî, gava axêverên wê bi Elmanî dipeyivin, devoka wan jî bi heman navî tê binavkirin. Zaravayên weke Saksonyayî, Kolşî, Hessî, zimanên weke Schwitzerdeutsch jî bi heman rengî ne. Gava axêverên wan bi Elmanî dipeyivin, navê ziman û şewezarê wan dibe navê devoka wan jî. Lê Elman çawa ji hevdu fêm dikin? Bi zimanê dibistanê. Elman jê re dibêjin Hochdeutsch.

Herkes li mala xwe bi devoka xwe diaxive, lê li dibistanê fêrî Hochdeutsche dibe. Rojname û kitêb bi zimanê dibistanê derdikevin. Radyo û televîzyonên neteweyî bi zimanê dibistanê weşanên xwe dikin. Loma jî hemû Elman ji hevdu fêm dikin.

Heger herkes bi devokên xwe kitêban derxîne, dibe ku Elman ji hev fêm nekin. Loma zimanê dibistanê muhim e. Yekîtiya gel çêdike.



FIRAZ BARAN

Wekî din jî li Elmanyayê her devok xwe diparêze. Gelek kes li mal, gund û bajarên xwe bi devokên xwe diaxivin. Dîsa gelek televîzyon û radyoyên devokan hene. Li gelek ciyan jî mameste bi devoka wî bajarî diaxivin. Lê nivîs zimanê dibistanê ye.

Elman û pirranîya gelên li cîhanê ev derdê xwe di sedsala 19'an û 20'an çareser kirine. Lê em Kurd çawa bikin? Dewleta me tine ye. Dagirkerên welatê me naxwazin ku em bi zimanê xwe biçin dibistanê. Îro tenê li Başûr û Rojavayê Kurdistanê dibistanên me hene. Loma jî Kurd hemû nikarin bi zimanê dibistanê bixwînin û binivîsin.

Pirsgirêkek jî alfabe ye. Em Kurd bi sê alfabeyan dinivîsin: Latîni (Kurdên Bakur û Rojava), Erebi (Başûr û Rojhilat) û Kirîli (Kurdên Qafqasyayê). Ango heger kesek bixwaze kitêbên Heciyê Cindî giş bixwîne, ji ber ku kitêbên wî hemû nebûne Latîni, ew kes wê mecbûr be ku alfabe Kirîli jî zanibe. Dîsa şewezar û devokên me jî tîra xwe hene. Loma em mecbûr in, zimanê dibistanê jî bi pêş bixin.

Zimanê dibistanê çima muhim e? Em li mînakê Swedê binihêrin.

Li dibistanên Swedê mafê fêrbûna xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî jî heye. Kurdekî ji Torê li mala xwe bi devoka Toriyan, Kurdekî ji

Herkes dikare li ser Youtubeê jî bibîne. Kurdên Efrîn, Dîlok, Bazarcix, Elbistan, Meletî, Çorum, Konya, Kirşehir û Yozgatê bi devoka Berferêt diaxivin.



HOZAN ŞÊXO

Konyayê jî bi devoka Berferêt diaxive. Lê li dibistanê fêrî zimanê dibistanê dibin. Heger bixwazin, nameyan bi zimanê dibistanê jî hevdu re dişînin. Kitêban bi zimanê dibistanê derdixînin. Loma jî herkes jî hev fêm dike.

Medeni Ferho û devoka Toriyan

Nivîskar Medeni Ferho ji Torê ye. Romana xwe ya bi navê "Xaltika Zeyno" sala 1997'an hat weşandin. Gelek rexne lê hat kirin. Çima? Ji ber ku Medeni Ferho gelek gotin û biwêjên devoka Toriyan bi kar anî. Wî rexne qebûl nekirin û got, "Ez xizmeta zimanê Kurdî dikim. Zimanê nivîskî jî nû ve bi pêş dikeve." Salên bihurîn, gotinên Ferho piştrast kirin. Ferhengên nû derketin. Me dit ku gotin û biwêjên Ferho nivîsandibûn di ferhengên de cihê xwe girtine.

Nexşeya devoka Berferêt

Herkes dikare li ser Youtubeê jî bibîne. Kurdên Efrîn, Dîlok, Bazarcix, Elbistan, Meletî, Çorum, Konya, Kirşehir û Yozgatê bi devoka Berferêt diaxivin. Kilamên xwe bi vê devokê dibêjin. Ango mirov dikare bêje, herî kêm 4 milyon Kurd bi devoka Berferêt deng dikin.

Gundê Qaşanê

Gundê Qaşanê (Kaşanlı) ser bi Yarpûzê (Afşin) ye. Ev gund bi aşiqên xwe navdar e. Emekçî, Vicdanî, Perîşan Guzel, Perîşan Ali, İsmail İpek û Meçhûlî ji gundê Qaşan in. Lê navên ku me gotî bi Tirkî gotin. Wek mînak Emekçî bi sedan kilamên bi Tirkî çêkirine û bi dehan hunermendan kilamên wî gotine. Berî nişfa wan

gundê Qaşan bi beytdar û dengbêjên xwe ve navdar bû. Piştî sala 2000'î du hunermend li Qaşan derketin û bi Kurmanciya Berferêt CD derxistin. Yek jî wan Hasan Yildiz e û yê jî Firat İmîrza ye. Û gelek kêfa gelê me ji dengê wan re hat. Her wiha Firat kilam, lorî û şînen gundê Qaşanê jî berhev dike. Niha di arşîva wî de li ser 50 kilamên bi devoka Berferêt hene ku hetanî îro jî aliyê nişfê nû ve nehatine gotin. Firat dibêje, "Kilamên berê çirokên xwe jî hene."

Şêxo

Hunermend Şêxo sala 1959'an li gundê Karolmazê (ser bi Markazê) hate dinê. Hetanî îro neh berhem kaset û CD derxistin. Berhemên Şêxo ev in:

- * Aşık Dertli (1977)
- * Hawar Hawar (1979)
- * Ji Bo Biranîna Cegerxwîn (1985)
- * Prangalar (1994)
- * Poesie Der Wurzeln-Wurzeln Der Poesie (1995)
- * Dengê Axê (2002)
- * Li Ezmanan Hezkirin (2005)
- * Dengê Avê (2009)
- * Dengê Agir (2013)
- * Dengê Hewa (2017)

Hunermend Şêxo projeya "Çar Anasir" da pêşya xwe û çar berhemên bi navê Ax, Av, Agir û Hewa bi devoka Berferêt derxist. Şêxo sala 1977'an çû Elmanyayê û bû endezyarê makîneyan. Li Elmanyayê ew di nav endezyarên ku Endustrî 4.0 anîne de cih digire.

Koma Reç

Sah Sultan di berhemên Koma Reç de ji kilam gotin. Koma Reç konfêkê muzîkê ye û endamên xwe ji hemû Elbistanî ne. Koma Reç bi devoka Berferête kilaman dibêje. Di komê de Şah Sultan, Muzaffer Yıldız, İsmail Yapıcı, Aziz Guzel, Dursun Kul, Mehmet Yıldız û Halil Yıldız cih digire. Şah Sultan di kilama Dayê de ku muzîk û gotinên wî ne, wisa dibêje:



mancî, em dikarin bibêjin, her ku diçe berhem zêde dibin.

Min ji piştî sala 2009'an dest bi lêkolînê herêmî kir. Kilamên Bilal Goksungur, Hasanî Qarayîlên, Seçiyê Rençberlik û wekî din berhev kirin û weşandin. Di sala 2018'an de ji kitêba bi navê "Mayrik"ê min derxist. Kitêbê de şin û çiroka Mayrikê heye. Şin 50 çarîne ye. Min bi pêşniyaza sopranoya Kurd Pervin Çakar şin him bi devoka Berferête, him jî nivîsa dibistanê weşand. Wek minak çarîneyek wisa ye.

Çimo ame darbadarin
Oy oy dayê xarîb dayê
Am ja hav bê xabarin
Oy oy dayê xarîb dayê

Kas darde kasi nobîni
Oy oy dayê xarîb dayê
Av dawrono qa nomîni
Oy oy dayê xarîb dayê

Doste sadiq endi namon
Oy oy dayê xarîb dayê
Mino bokî* hot-çû zamon
Oy oy dayê xarîb dayê

Min çi kir?

Piştî salên 2000'i li herêma Elbistan û Markazê bi dehan CD yên bi devoka Berferête derketin. Mehmet Bayrak ji di kitêba bi navê "Muzik Dans û Şarqiyên Kurdî" de 250 çarîn û bi dehan stranên bi devoka Berferête weşandin. Kurt û Kur-

Bi devoka Berferête

Lê dêr a dêr a lê teli dar a
Lê ti nagara teli qansêr a
Îwo la dorê lo ta da garim
Az pandirim ki ti kêr a
Aze Mayrike doxima jêr a

Lê la minê Mayrik la minê
Ta orak bardo lê cone minê

Bi nivîsa dibistanê

Lê dar e dar e lê teli dar e
Lê tu negere teli qansêr e
Îwo li dora lo te digirim
Ez pendirim ku tu kêr e
Ezê Meyrikê daxima jêr e

Lê li minê Meyrik li minê
Te arek berda lê canê minê

Yek ji cara yekemîn 180 gund û gundikên Markazê, min bi Kurdî nivisandin. Pirranîyan wan cara yekemîn min qeyd kirin. Gund û gundikên Elbistanê jî wisa. Dîsa ez navên zozan, ziyaret, newal, çiya, av, şikeft û wekî din jî bi Kurdî dinivîsinim. Min bi hezaran navên erdnîgariya Elbistan û Markazê bi Kurdî qeyd kirine.

* Bayekî



Malê Me Nargale

"Malê Me Nargale" navê kitêbekê ye. Balkeş e, kitêb 391 rûpel e û hemû bi devoka Berferête hatiye nivisandin. Ez bawer im ev cara yekemîn e.

Nivîskarê kitêbê Mustafa Yıldız e. Ew bi xwe jî gundê Nargaleyê (ser bi Elbistanê). Kitêb di sala 2018 an de li Enqereyê di nav weşanên Sîtav de hat çapkirin. Kitêb berferêti qala gundê Nargaleyê dike. Nivîskar hin biwêjên ku li Nargale tê gotin wisa nivisandiyê (Rûpel a 117):

Dav haya ziman tuna ya.
Na sariya na biniya.
Şave jî haqakî xwa î haya.
Tu qâlâ sân daka. (sân: se, kuçik)
Sarsotakî era.
Çav têrnabûn.
Pişt lê fira.
Nav dinân da baqil nawin.



Mînaka Nifşê Nû: Rûmet Alxas

Rûmet Alxas 1990'an li bajarê Aachenê (Elmánya) jî dayik bû. Ew doxtor e. Zanîngeha Bonnê xelas kir û li nexweşxaneyê dixebite. Her wiha Rûmet kilamên bi tarza popê çêdike û dibêje. Hetanî niha 50 kilamên Kurmancî û Kirmanckî nivisand û muzîka wan çêkir û li studiyoyê jî qeyd kir. Kilamên wî bi Kurmancî piranî bi devoka Alxasî ne.

Dayika Rûmet Elman e. Bavê xwe Kurd e. Ew berê Elmani hîn dibe. Dibistanê jî fêrî zimanê Ingilîzî, Fransî, Latînî û Yewnanîya kevn dibe. Niha

Kurmancî û Kirmanckî jî dizane. Pîrik a Rûmet Kurmancî, bavkalê xwe jî Kirmanckî dixave. Rûmet dibêje, "Ez berê li

ser kitêban Kurdî fêr bûm. Paşê çûm cem pîrika xwe. Min dît ku devoka me û zimanê kitêban cûda ye. Em Alxasî ne. Niha ez devoka Alxasî jî diaxivim."

Li Elbistanê 26 gund û mezrayên Alxasiyan hene. Eşîra Alxasan cîranên gundên Kurecîgê ne. Hîn deng hene ku li Kurdistanê tenê eşîra Alxasî û Kurecîgê derdixînin.

Me çima Rûmet minak da? Ji ber ku di nav ciwanên Elbistan, Markaz, Kurecîg û Sarizê de axaftina Kurmancî kêm dibe. Lê Rûmet di ciwantiya xwe de bi serê xwe fêrî Kurmancî bûye û xwe pêş xististiye.



Ji gundê Maxsiyan yê ser bi Markazê daweteke kevin. Li gori texmînan wêne yê salên 1950'yî ye.

Cengiz Aslan û Kurecîga

Cengiz Aslan ji gundê Kurecîgê ye. Di sala 1985'an de ji dayik bû. Beriya bi du salan wî CD'yek bi navê "Kilamê Dilan û Şîn" derxist. Cengiz Kurecîgê jî baş nas dike. Me bi Cengiz re hevpeyvînek kir.

Cengiz çend gundên Kurecîgê hene? Navên wan ê Kurdî çine?
24 gundên Kurecîgê hene. Navên wan fermî Tirkî ne. Bi Kurdî û bi Tirkî navên gundên me wisan in:

Kurdî

Âmokân
Bayramân
Bakirân
Bilamân
Çarkazân
Çawurma
Damirciân
Hâciân
Hârûnân
Kelân (Çelân)
Kelleran
Kêxân
Kirluşağı
Korsulêmânân
Ortaköy
Qâjîkân
Şarân
Qâsimân
Qubâtân
Şamiskân
Tapkiniân
Târiciân
Tumukân
Xançarliân

Tirkî

Taşevler
Bayramuşağı
Bekiruşağı
Çaklıpınar
Çerkezuşağı
Çevirme
Demirciler
Dutlu
Harunuşağı
Gürkaynak
Keller
Kahyalı
Durulova (Körsüleyman)
Yaylımlı
Kepez
Kasımüşağı
Tataruşağı
Düvencik (Güneşli)
Aksüt
Darca
Dumuklu
Hançerli

Tu çima tîpa â bi kar tîni?

Ez ne zimanzan im, lê li herem a Kurecîg, Elbistan û Markazê (Pazarcik) dengê heye. Di navbera tîpa a û o'yê de ye. Loma em wî dengî wek 'â' bi kar tînin.

Tu gund bi gund digerê û kilam û şînan berhev dikî. Kîjan şînê bala te kişand?

Şîna Mala Mécir bala min kişand. Di sala 1916'an de Rûs êrişî Erzînganê dikin. Ali Macir malbata xwe wînda dike. Wê çaxê 10 salî ye. Dikeve ser rêyan û hetanî Kurecîgê dimeşe. Li gundê Hârûnân, Malê Çorlî wî dikin mêvan. Dem derbaz dibe û dibe zarokê wê malbatê. Mezin dibe, dizewice û dibe kesekî Kurecîgî. Lê çiroka



xwe ji bir nake. Şînekê dibêje. Malbata xwe çawa wînda kiriye, çawa ketiye rêyan û çî hatiye serê wî di şînê de derbas dibe. Cara yekemîn ez vê şînê bi we re parve dikim. Şîna Ali Macir wisa ye:

Macir la goçan daniştin
Li tu dare rûnaniştin
Darê ki bê û baran dibari
Koz* la şîna xwe dahiştin

Ja Erzirom pazê mor te
Şivanan xwa daye orte
Qurban navê „maciran“ la ma non
Ku navê xaribon la ma non
Çî qand la ma ê bi zor te

Am macirin ne ja virin
Am goçarin ne ji virin
Welatê xarîb em xwarin
Xwarin dîsa teva kirin

Dema ku tu li Kurecîgê digerê çî tesîr li te dike? Gundên vala, kal û pîrên me...

Em civakeke koçber in. Berê em bihar û havînan diçûn zozanan, lê zivistanê em vedigeriyan. Îro em diçûn û paş xwe meze nakin. Yek ji pîrên me ê 80-85 salî li min tesîr kir. Bi tenê dijin, lê wek peykerekî li ser lingan in. Di xaniyên axî de kutak hene. Kutak tawanê digirin. Hin xaniyan diwar hildeweşin lê dîsa jî tawan li ser lingan in. Halê me wisa ye. Pîrên me wan kutakan temsîl dikin. Dapîra min jî 98 salî bû. Xaniyê xwe kevn bû lê terk nekir. Marek mezin jî ketê. Dîsa derneket. Bi wî marî re ma. Pîra min ji ber ku mala xwe terk nekir. Li gorî min mîrasa herî mezin ew e.

Li Kurecîgê kesên ku bi şînên xwe ve tene nasîn kî ne?

Dema ku mirov digere dibîne ku li gundên Kurecîgê hemûyan çîrokbêj hene. Lê kesê ku şînê dikin jî zêde ne. Ên navdar ev in:

- Rahmetî Totik Xaç, Zizê Mala Apce û dapîra min Kofê Aslan.

Ê ku jîyan dikin jî ev in:

- Mayrika Mala Apçe: Ji gundê Kepezê
- Asur Kaplan: Ji gundê Bakirân
- Baxde Polat: Ji gundê Çawurma
- Pîrê Tamik: Ji gundê Hâciân

* (Koz: Ji bo zarokan dibêjin. Keça Ali Macir Altikê Mala Mécir min re wisa gotibû: "Wê demê gelek zarok mirine.")

Kilama Şeva Hineyê

Ev kilama şeva hinê min ji devê Sultana Mala Bille ya ji gundê Zînkân (ser bi Markazê) bihiştîye. Min ev kilama muzîka wê gelêrî ye, berhev kiriye:

Atê rowa mi dogir a
E ki mi ban derî bigir a
Atê azêk wa bûk bim
Ti wa dû min magîr a

Çi dorik o ki dave şat e
Bo lêtexî qol diqat e
Onê onê ê pirê zor a
Waxtê ki kaçik la molo bove vadaqat e

Bûk dowayste la dave derî
Şorpê surê la sar seri
Bûkê hara gûlo gûlo
Şone te mazilê xwa baya seri

Bûk dowayste la sar o ve
Porî dirêj hata nov e
Av bûkê ki wa bûk bi
Têr nawû ja molo bov e

Bar darî ma î wa dor a
Derî bigir hawayî sor a
Onê, "Ti çimo da gîrî
Lowikî ma jî êvorî neya mol a"

Sultana Mala Bille dayîka hevalê me Erdal Aliçînar e. Xaltîka Sultan ne hunermend e. Lê li ser bûyerên êş û bextewarî jî nişka ve kilam û şînan derdixîne. Ev kilama şeva hineyê jî di dawetêkê de gotiye. Xaltîka Sultan li bajarê Kolnê jîyan dike. Min li mala wan li kilamê guhdarî kir û qeyd kir.

Li herema Elbistan û Markazê li ser şeva hineyê kilamên gelêrî hene. Min hin di sala 2010'an de berhev kirin û di kitêba bi navê "Pazarcik"ê de weşand. Hin çarî-nên gelêrî yê jî ve kitêbê ev in:

E ki tena qontirin
Sar bore xwa sontilin
Dava pêşse la bo wû
Zova la bûke şo wû

Nolê hon nolak a kûr a
Lê da çerî mosî hûr a
Lê molkê bûkê ma bidin
Molkingê ma yê dûr a

Hinê bûka la taştekin
Pê haske ove lêkin
Bonga boví bûke kin
Oyce da diîf de kin

Hara bûkê hara
Kîworê hara
Ki ti nixwoş bû
Kî ye sarî ta vada

Devok

di navbera jimekanqutkirin û cihêbûnê de



Roland Barthes di darsa xwe ya destpêkê ya profesoriyê de li Collège de Franceê sala 1977'an wê xetên "Eti-keke zimanê wêjeyî (éthique du langage littéraire)" xêz kirin. Li gorî wê di her "biwêjê [...] gelek ziman" hene û qanûnçêker yekîtiyêke zimên ranagihîne, lê belê hînbûn û bikaranîna zimênê cihê di nava zimanê Fransî - lewma ew behsa vî zimanî dike - teşwîq dike. Bi pirrhejmar-kirina zimanekî pêşî hewldanek xwe dide der û ew hewldana xwe xilaskirinê ye ji wan meylên yekkirin û besitkirinê yê di warê zimên de homojenker. Ji bo wê jî cihêti û xislet beramberî nîzama zimên a hegemonyal tên nîşankirin û di nava çandeke yekrengker de tên kedîkirin, û ew di binê doza homojenkirinê ya zimanekî standart yan jî zimanekî bilind ê di nava mekanekî yekgirtî yê zimanî de winda dibin û namînin. Devok weke yekê jî gelek zimanên di nava "zimanekî" de û her wiha şîra devokê weke şîra di nava nîzama nîrxan a kanonên wêjeyê de ya ku weke zimanê perwerdeyê û bilind hatiye şîfrekirin, di heman demê de "çavkaniyên çandî" ne. François Jullien ji wan re dibêje, lê ev fenomen ileh bi awayekî madî çandên temam dernaxin holê. Tehlûke li ser wan heye ku di bin zexta meylên homojenker û imperyalîst de tine bibin û careke din venagerin. Helbet ew derfet heye ku xweser ji çavkaniya xwe ya cihî weke hêmana çandî li nava civakê belav bibin.



Sebastian LÜBCKE*

Ziman di warê siyasî de her tişt e, lê ne bê guneh e. Ne ku tenê bi gotinên Ludwig Wittgenstein, dinya me (yan jî têgihîştina me ya dinyayê) di warê strukturel de tenê heta wê de vera zimanê me digihêjîye, diçe; ji wê û wê de, bi diyarkirina xetên mekanekî yekgirtî yê zimanî, doza ji bo erdekî netewê dewletê yê di warê etnik, dinî û çandî - êdî ev çî dibe bila bibe - de homojen jî pirrcarî xwe dide der. Çawa Ivan Çolović di ceribandina xwe ya rexnegir a li ser terora çandê li Balkanan de zelal darîçav kiriye. Dîroka mêhtingeriyê jî nîşan dide ku ziman beşeke diyarker a stratejiyên imperyalîst bû û îro jî wisa ye. Bi van stratejiyan zimanê mêhtingeran li ser civakên kirine mêhtingeh hatine ferz kirin; wê jî li ser wan ferz kiriye ku weke "çavkaniyên çandî" yên cihî, dev ji zimanê xwe berdin û berê xwe bidin zimanê serwerên zirhêz. Ev ne tenê ji bo dîroka kevin a mêhtingeriyê lê ye, ev jî bo hegemonya zimên a zimanên dinyayê jî lê ye. Statuya van zimanan bi xêra hêza aborî û siyasî ye, û karê hin civakan hêsan dike ku dozên xwe yên gerdûnîbûna "çandî" û modelên xwe yên jiyane bi zimanê xwe bê navber belav bikin, bibin wela-tên din, nav civakên din.

Helbet pirrengiya zimanan di nava erdekî de her wiha dikare rê li ber pirsgerîkên komunikasyonê veke. Ev mesele ye, ji ber ku ji bo bihevrejî-

yanê jihevfermîkirin bivênevê ye. Lê ji perspektîfa teorîk pîrsek xwe dide der, gelo her tişt divê timî li hev bike û bi tevnekê bi hev ve girêdayî be? Gelo yekkirinazimani di zanîna roja me ya îro ya aborî de dawîya dawî ne tenê ji bo wê ye ku herîkîna mal û sermayeyê ya global heta mumkin e bê pîrsgerîk misoger bike? Devok berxwedan in û pîrsgerîk in, û mirov dikare li wan di wê dijber-eya doza gerdûnîbûnê ya zimanên imperyalî û nîzamên wan ên nîrxan de serwest bibê.

Cihê qutbûna ji nîzamên mezîn

Kitêba Walter D. Mignolo ya bêqisûr a li ser Epistemischen Ungehorsam (Îtaetnekirina Epîstemîk) devokan weke formên 'cihê qutbûna' ji nîzamên nîrx û dinyayê dibîne, û ew timî di nava ziman de hişk bicihkirî ne. Li gorî Walter D. Mignolo bîrewerîya xwe dispêre helwêsteke tevî 'çavkaniyên çandî' yên cihî pêkhatî yên ku struktur û adetên wan aso û zanînen din dihevinin, weke 'zimanê piçûk' dibe ku derfeta sînorên vekirîtir ber bi dinyayê (û têgihîştina wê) ve vekin. Ew li vir wan li ber zimanên 'mezîn' ên standard digire û dibêje, berevajî gerdûnîperestîya ziman a modern, ew dikin ku mirov karibe li nîzameke "plurîversal" (pirrdinyayî**) a "dinyayêke siberojê ya global a ku gelek dinyayan dihevine" jî bifikire. Bi 'qutbûna' ji nîzamên hegemonyal ên dinya, nîrx û heta yên zimanî re elaqeya xwetecrîdkirineke nasnameyî ya li dijî biyaniyan nîne, berevajî wê, elaqeya wê bi azadiya ji modelên zirhêz ên hegemonyal ên 'çandî' re heye. Ev modelên zirhêz ên hegemonyal xisleta xwe (ya zimanî) weke gerdûnî yan jî qet nebe weke lipêştir dibînin. Heger mirov karibe xwe ji wê zextê xilas bike, hingê derfet peyda dibe ji bo "diyalojîke pirrdinyayî ya hevtayan", hingê li gorî wî "avahiya komunal û pirrdinyayî" bi "plana sereke" ku wê di pêvajoyeke komunal de bê bipêxistin, mumkin dibe. Zimanên wê avahiya hanê jî wê weke dinyayên tê de bicihbûyî, pirreng be.

Xewn û xewnerêşka ya piçûk

Ji bo qutbûna ji nîzamên hegemonyal şertek heye û ew jî qutbûna ji cih û mekan e (Deterritorialisation). Gilles Deleuze û Félix Guattari di nîvîsa xwe ya li ser Kafka de behsa "xewnê" dikin; ev xewn jî ya "karîna piçûkbûnê ye, ya bisexstîneke piçûkbûnê ye", da ku mirov karibe xwe ji 'zimanê mezîn' ên zirhêzan û her wiha ji 'wêjeya mezîn' a kanonê (qaîdeya sereke) xilas bike. Deleuzes û Guattari di hizra xwe ya li ser 'wêjeya piçûk' de dibêjin: "Bikaranîna pirrzimanîbûnê di

zimanê mirovî bi xwe de [...] ew e ku bindestê di zimên de li ber serdestên di zimên de radibin, dîtina mekanên neçandê û paşvemayîna zimanî ye, dîtina wan herêmên Cihana Sêyem a zimanî ye ku pê zimanek difilite." Lê herçî şîra devokî ye ew nimûneyeke bidestnîşandanê ye ji bo wê şîrê ya ku heta bi zelûliyêke mutleq tîr dibe û ji wê jî xweserîya xwe ya dijdîskursîf*** bi dest dixe. Mesela şîrên H.C. Artmann ên bi navê Şîrên Viyanayî (Wienerische Gedichte) li tecrûbeya bihistina dangan a axaftvanên zimanê standart hatiye anîn. Rêzimana wan, peyvên wan û bilêvkirina wan xwe ji maneya ji rêzî- resmê ya zimanê hegemonyal vedidize û wê weke çalakîyêke şoreşgerî ya jimekênqutkirinê dike, û pê re jî ew hem xatirê xwe ji zimanê stand- dard û hem jî ji mane û xuyên nîrxan ên vî zimanê standard dixwaze. Hema ku tiştêk dikeve dirûveki ku neyê fermîkirin, ew dibe xwediyê efekteke kenê mirovan tîne, hewayek yan jî au- rayeke tirsnak ya ku zehmet e mirov lê serwest bibê, tesîreke acizker, havîker e ev. Û ev tesîr qebqebûyî dike li zimanê hegemonyal û pê re ji wan zirhêzên siyasî, lewma, êdî tehlûke heye ku ew tişt a ku ew dibêjin, dibe ku bêmane bibê. Ev hizr jî bo teoriya wêjeyê ya Formalîzma Rûsî, Di- bîstana Frankfurtê yan jî Michel Foucault, û De- leuze û Guattari navdî ye. Devok wê teoriyê bi kar tîne bi wê yekê ku xwe ji zimanê standard mekanî qut dike û di heman demê de rehên xwe cihî berdide erdê. Rehet e di lihevnekirina bi yên din re, henekê xwe dike, tevna mezîn a maneyan ji ber isra ra wê ya li ser ya 'piçûk' bi awayekî îronîk beloq dibe. Gava wê dike ti doz û îdiaya wê ya serwerî û hegemonyê nîne ku bi yên mezîn û hêzdar yan jî zimanên mezîn û hêz- dar re qayîşê bikişîne. Devok dibe xewneke ser- hişk a kêfoyî ya karîna piçûk bûnê, ya wê yekê ku mirov êdî ne mecbûr be di şerê mezinan de hebe, mirov karibe vekîşe, da ku ji wir ve xwe ji temama mezîn xilas bike, jê bide alî. Ev xewn qet nebe wê dewam bike heta ku ev devok xwe bi efsane û ji nû ve bi mekên ve girêdana xwîn û erdê, derfeta nîzameke pirrdinyayî ya dinya û nîrxan berhewa bike. Lewma di ya 'piçûk' de xewnerêşka nasnameperestiyê jî li cem xewma pirrdinyayîbûnê heye.

Wergera ji Elmanî: Luqman GULDIVÊ

* Germanîstîk û Filozofî xwendiyê û doktoraya xwe li ser Zanîsta Nû ya Wêjeya Elman kiriye.

** Plurîversal weke dijbera unîversal (yek- dinya/yekgerdûn); têbîniya wergêr.

*** Li vir bi dijdîskursîf îşaret bi ya li dijî gotara mainstream a li ser babetekê tê kirin.

Îdeolojiyên zimên û nasname li sinifên mîrate û zimanê Kurdî ên li Londonê

Ev gotar bi îdeolojiyên zimên ên di nava wan xwendekarên zimanê mîrateyê (HLL) ên Kurmancî li du sinifên di nava ci-

vakê de yê li Londonê, dadî-keve. Daneyên ku gotar xwe dispêrinê çavdêriyê 18 mehan a li van sinifan û hevpeyvînan nivestirî yê ji 2011'an heta bi 2013'an ên di nava civaka Kurd a li Londonê de. Du cureyên Kurmanciyê xwe didan der ji şiroveyên metalinguîstîk ên beşdarên van hevpeyvînan de ku ji bo analizê

balkêş bûn: Kurmanciya Bohtan, pirranî weke ya "munasib" dihat binavkirin, û Kurmanciya Mereşê ku bi pirranî weke "ne munasib" dihat terfîkirin. Herçî zimanê van dersan dixwest fêr bikin ji Kurdiya "akademik" bû û têkiliya wê ji bi Kurmanciya Bohtanê [nivîskar li vir behsa têgihîştina li cem xelkê Mereşê dike; têbîniya wergêr] re dihat danîn; lê belê pirraniya xwendekaran bi Kurmanciya Mereşê dipeyvînin. Gotar wê xwe bi sîpêre teoriyên li ser îdeolojiyên ziman (Irvine û Gal 2000; Piller 2015), îdeolojiyên zimanê standart (Milroy û Lesley 1985) da ku li gotarên (diskursên) ji hînbûna zimani xwe didin der û ka di nava sinifên dersê de îdeolojiyên zimên çawa tî avakirin, muzakerekirin û li ber wan tê rabûn.

Xwendekarên van sinifên hînbûna Kurdî yê kete ber awirên vê lêkolînê, di astên cihê de bi Kurmancî dizanin û ji bo behremendiya xwe ya nivîsandin û xwendina Kurmanciyê bi pêş bixin. Ev xwendekar bi piranî çalakger bûn û weke sedemên hînbûna Kurmanciyê li Londonê ji wan got:

- Ew dixwazin hîni zimane xwe (weke xwendin û nivîsandinê) hin bibin ji ber ku ji ber zexta li Tirkiyeyê, wan nekarî van behremendiyên bi dest bixin;

- Ew dixwazin xwe ji wê tecrûbeya linguîstîk xilas bikin, ya ku ku dikir ew xwe bê hêz his bikin;

- Ew dixwazin bi rabihuriya xwe re ji nû ve têkiliyê daynin;

- Ew wê zextê his dikin ku li Melikiya Yekbûyî

divê "ew bi zimane xwe zanibin", ji ber ku ziman weke beşeke muhim a nasnameya etnik tê dîtin li cihana rojavayî (Yilmaz, 2016)



Dr. Birgul YILMAZ

Li Melikiya Yekbûyî qebûleke fermî ya Kurmanciyê û piştgiyariyêke înstîtuşiyonê ji nîne. Ew ne weke zimaneke hindikahiyekê ne ji weke zimaneke koçberan tê qebûlkirin. Tevî ku hikûmetên cihê, şaredarî nivîs, agahiyên bi Kurmancî û Soranî didin û xizmeta bi van zimanan dikin ji, gelek beşdarên vê lêkolînê gotin, ew nikarin ji van xizmetan sîdê wergirin ji ber ku behremendiyan wan ên xwendin û nivîsandina bi Kurmanciyê nînin.

Bi ser vê de ji tiştêkî din heye, Mehmet Bayrak, nivîskareke ku xwe weke Turkolog û Kurdolog terfî dîke, îdîa dike ku Kurdên "din" rexneyan li Kurmanciya Mereşê dikin û ev ji dibe sedem ku mirov bitirsîn bi Kurmanciya Mereşê dipeyvînin ((<http://www.binboga.org/maras-Kürtcesi-soyleminin-sakincalari-0/> [accessed 29 November 2015]).

Ev gotar ji weke Bakhtin, bê ka ziman ne çî ye, li ziman dinihêre; ziman "[...] ne sistemeke mucered a kategoriyan rêzimanî ye, lê ji wê û wê de ziman weke îdeolojîk têrkirî be, weke nihêrineke li dinyayê be, heta weke fikreke berçav be tê dîtin; ev ji di warên jiyana îdeolojîk hemûyan de jîhev-fêmkirineke herî zêde misoger dike." (Bakhtin 1981: 271)

Piştî vê em dikarin behsa wê bikin ka ev gotar çawa li îdeolojiyên ziman dinihêre, wan çawa fêm dîke: "rêzek baweriyên li zimên yê ku bikarhêner weke rasyonelîzêkirin yan jî rewakirina struktura zimane mirov pê dihisin û bikaranîna wan, wan îfade dikin" (Silverstein 1979: 193). Çawa ku Piller (2015) dibêje:

Îdeolojiyên zimên destêkê didin bikaranîna zimên, ew ji ji aliyê xwe ve dirûv dide îdeolojiyên zimên; ew xizmeta armancên civakî dikin, bi gortî din hedefa îdeolojiyên zimên ne linguîstîk in, lê civakî ne. Weke her tiştê civakî, îdeolojiyên zimên ji peywendîdar, pîrrhejmar in û li ber wan tê rabûn. (Piller 2015: 4)

Modela ji bo analizê

Ji bo analizkirina awayê avakirin, muzakerekirina îdeolojiyên zimên û berxwedana li dijî wan, ez modela Irvine û Gal (2000) bi pêşxistî bi kar tînim, ew ji bo vê têgeha pêvajoya semiyotîk [di zimanzaniyê de nişandêr; nişeya wergêr] bi kar tînin: "Ikonkirin; di nava wê de veguherîne nişana peywendiya di navbera cure û îmajên civakî de heye ku pê ew bi hev ve girêdayîne. Lixwevegerîna fraktal: tê de projeksiyona di asteke din de ya peywendiyêke dijber û beloq a di asteke de. Jêbirin: ev ji pêvajoya ku tê de îdeolojî bi hêsanî meydana sosyolinguîstîk, dike ku hin kes yan çalakî (yan jî fenomenên sosyolinguîstîk) xuya nekin. (Irvine and Gal (2000: 87-89)

Ev model dikare bi daxuyaniyên weke "Maras Kürtcesi çor e" yan "Maras Kürtcesi şikestî ye" (Yilmaz 2016) bi kurtî bê terfîkirin; ev jî xwedî wê potansiyelê ye ku axaftvanên Kurmanciya Mereşê yan jî Kurdên Elewî weke "çor" yan jî "şikestî" bî ikonîzêkirin. Ev terfînan hanê dikarin weke nûneriya ikonîk ji bo xelkê Mereşê bî şirovekirin. Herçî lixwevegerîna fraktal e, dikare bi têgehên "wekhevî" û "cihêti" elaqedar bî dîtin; gava ku kom yan jî ferd daxuyaniyên ji helwêstên hember îfade bikin, weke nimûne, "Kurdiya me têkelhev e bi Tirki re"; ev jî dikare bî şirovekirin weke zimane "me" li gorî zimane "wan" têkelhev e û ne munasib e û wekî din. Herçî pêvajoya dawî ye, yanî, jêbirin, maneya wê çî ye, çalakîyên zimani yê hin ferdan êdî xuya nakin, li vir pîrrangiya navxweyî jî holê radiibe. Min di sinifan de gelek minakên înteraksiyonê dîtin ku mamosteyan hema welê hiç îhtîmam neda zimane herêmi yê şagirtan. Lê belê, şagirtan pîrraniya caran li ber xwe da li dijî fermanên jî jor ve bi rêya muzakerekirina nasnameyên xwe.

Li vir ez Lippi Green (1994) a bir bixim ku dibêje. "Pîrraniya cihêbûna zimani li dora nasnameya civakî ava bûye. Linguîst bi vî dizanin, lê ne linguîst jê pê dizanin, û li serê kar dikin; aksan vediguhere terz û navgîna ji bo liderhiştinê. Rastî ev e, her cara mirov aksaneke red dikin, ew di heman demê de nasnameya kesê dipeyve jî red dikin: nijada wê/wî, mîratêya etnik, kokên neteweyî, girêdanên herêmi yan jî



çina aborî. (Lippi Green 1994:165)

Ji ber vê yekê cihêrengiya zimanî ji nêz ve elaqedar e bi nasnameya civakî re, "ji ber ku axaftvan dibe ku cihêtiyên dengsaziyê bi kar binin da ku nîşana komên civakî yên ku ew xwe ji wan hesab dikin, hildin" (Hudson 1996: 45). Cihêtiyên îdeolojîk ên girêdayî cihêrengiyên zimanî ne, di warê naskirinên me de xwedî maneyên çandî ne. Piştî danîna girêdana nêzik a teorîk a di navbera cihêtiyên zimanî, îdeolojiyên ziman û nasnameyên civakî, ez pir kurt behsa rêbazên ji bo analîza daneiyên ji du sinifan min berhevkerî, bikim.

Etnografiya lînguîstîk

Rêbaza ku vê gotarê xwe spartiyê, xwe dispîrê agahî û zanîna ji etnografiya lînguîstîk. Di çarçoveya vê lêkolînê de Etnografiya Lînguîstîk weke rêbazê pêremiamelekîrîne ya rêbazî û analîtîk hat bikaranîn, ji ber ku Etnografiya Lînguîstîk bala xwe dide nivîskîbûn, ziman, etnîkîbûna cihî, nasname û ne-wekhevîya li nava sinifê; îdeoloji û dînamîkên çandî: sinif weke meydanêke bihevne danûstendîne; û hin-

niya karekterên di kitêbê de ji çina navîn a Kurd in. Kitêbên beriya niha yên weke ya kitêba gramerê ya Baran Rizgar (1996) "Learn Kurdish: a multi level course in Kurmanji", ya li Melikîtiya Yekbûyî weşandî, cih dida karakterên cotkar û gundî û tê de Kurd weke gundiyan dihatin nîşandan. Herçî du kitêbên din in, Wezaretê Perwerdeyê ya Tirk ew hazir kirine, li ser Sirûda Tirk û wêneyê Atatürk hene. Di kitêba yekê ya Gulmez û yên din de (2015), karakterên dînî hebûn, weke jinên sergirtî. Di kitêba din de ya Yildirim û yên din (2015) cih dabû zarokan jî, û karakterên laîk nîşan didan. Ev her du kitêb di sinifên li Londonê de nehatin bikaranîn. Bi her halî, meylên cihê yê îdeolojîk yê kitêbên dersê meylên siyasî û îdeolojîk ên nivîskaran nîşan didin. Ev materyal tesîrê li danûstendina li nava sinifê jî dikin. Û di vê rewşê de kitêba dersê Hînkêrê dubendiyek di navbera axêverên Bohtan û Mereşê de hilberandiye û pê re jî nakokiyên di navbera şagirtên ji çina karker û yên ji çina navîn de hilberandine. Mikail ê mamos-te, ji herêma Bohtanê bû û ti paşxana wî ya perwerdeyî ya ji bo mamostetiya Kurdî weke zimanê

gerandina rêzimanê dest pê kir, xwendina metnekê yan jî xwendina jî kitêba dersê Hînkêrê û temaşekirina bernameyêke siyasî ya li ser komputera mamosteyî dewam kir. Piştî bi saetêkê navberêke çixare kêşan û çay vexwarinê hebû. Piştî navberê şagirt tîm cem hev û rêzimana Kurdî û peyvên Kurdî hîn dibin. Ders bi listikeke peyvan bi dawî dibe ku tê de şagirt hewl didin ji hev bibihurin. Ez dibihîsim ku hin şagirt bi pistepist dibêjin, "biz bôyle sôylemiyozuz" (Em wisa nabêjin). Rêwîtiya min li vir dest pê dîke: ez kifş bikim ka maneya "em" çi ye..."

(22 yê Adara 2012 an, têbîniya lêkolîner, sinifa li başûrê Londonê)

Li beramberî vê, di sinifa li rojhilatê Londonê de beşdar di serî de Soranî, bi şêwezarên din ên Kurdî û zimanên din ên weke Erebi, Farsi Ingilîzî û Tirkî dipeyivîn. Li sinifa rojhilatê Londonê jî pîrraniya şagirtan Kurdên ji Tirkiyeyê bûn û wan dixwest hînî Kurmancî bibin. Lê çendek xwendekarên din hebûn ji deverên Kurd ên Sûrî, Îran û Iraqê, ew bi Erebi, Soranî û her wiha bi Ingilîzî jî dipeyivîn. Li sinifa li başûrê Londonê bi xwe, şagirt bi pîrranî bi Tirkî û



● Cihêrengiya zimanî ji nêz ve elaqedar e bi nasnameya civakî re, "ji ber ku axaftvan dibe ku cihêtiyên dengsaziyê bi kar binin da ku nîşana komên civakî yên ku ew xwe ji wan hesab dikin, hildin". Cihêtiyên îdeolojîk ên girêdayî cihêrengiyên zimanî ne, di warê naskirinên me de xwedî maneyên çandî ne.

kirina zimên (Creese 2008). Rola din a Etnografiya Lînguîstîk di vê lêkolînê de terçîha berhevkerîna daneyan bû: hevpeyvinên nivîstîkirî, notên ji lêkolîna meydanî, çavdêriyên beşdar, qeydên deng. Rola şêwema Etnografiya Lînguîstîk di vê gotarê de ew e ku analîza min xwe dispîrê bikaranîna zimên a cihê wê diyarkirî (Copland and Creese 2015:29), li vir ez bi kar tînim "nêzikatiyêke ji jêr ber bi jor ve, di nava vê de kirina cihî û bihevredanûstendin di nava dinyayêke civakî ya firehtir de hatine bicîhkirin (Creese 2008:233); û ez wan mijar û gotarên ji danûstendina beşdar dayî der analîz dikim, li şûna ku kategorîyan ji jor ve daynim.

Daneiyên ev gotar xwe dispîrê wan du cure ne. Ya yekê analîza kite bi kite ya lînguîstîk e nexasim yê dengsaziyê yê weke []~[æ], û peyvên ku weke nîşanên nasnameya komê didin der. Asta di-duyê ya analîzê xwe dispîrê sê pêvajoyên semîtîk ên li jor min behsa wan kir: îkonîzekerîna, lêvegerîna fraktal û jêbirin.

Li herdu sinifan jî şagirtan Kurmancî weke zimanê xwe bi nav dikir û pesnê xwe pê didan ku ew hewl didin xwendin û nivîsîna zimanê xwe hîn bibin, ew zimanê derfeta wan nebû li Tirkiyeyê hînî bibin. Ji bo gelekî ji wan Kurmancî ne zimanê jiyana wan a rojane bû, belkî ji bo bi kal û pîran re bipeyivîn, bi kar dianîn. Mamoste, Hînkêr (asta 1 ê ta 3 yê) bi kar dianî. Ev kitêbeke dersê ye ku mamosteyê Kurdî yê di perwerdeya mainstream a li Tirkiyeyê de kar dikin. Kitêbê texlîda kitêbên dersê yê Ingilîzî yê li Tirkiyeyê ye û pîrsên sereke yê elaqedarî çinên civakî der dixê pêş. Weke nimûne pîrra-

mîrateya çandî nîne; lê belê tecrûbeya wî ya pratîkî di dersdayîna Kurmanciyê li Tirkiyeyê hebûye. Wî xwebexş kar dikir û materyalên xwe yê dersê bi xwe amade dikirin.

Tevî ku sinifa li başûr û ya li rojhilatê Londonê di meseleya bikaranîna Kurmanciyê de xwedî dînamîkên cihê bûn. Di sinifa li başûrê Londonê de şagirt bi pîrranî Kurdên ji Tirkiyeyê bûn, di sinifa li rojhilatê Londonê de Kurdên ji Iraq, Îran, Sûrî û Tirkiyeyê hebûn. Lê dîsa jî gotarên li vir hilberandî dişibîyan hev di warê avakirin, muzakerekirina wan û berxwedana li dijî wan de jî.

Avakirin, muzakerekirina îdeolojiyên ziman û nasnameyan û berxwedana li dijî wan

Di sinifa li başûrê Londonê de çalakgeriya siyasî serwer bû di nava şagirtan de, herçî sinifa li rojhilatê Londonê bû, xwediyê wê îdiayê bû ku siyasî béalitir e. Gava min dane analîz kirin, sê tişt kifş bûn:

● Avakirina cihêbûna zimanî û gotarên serwer

● Muzakerekirina cihêbûna zimanî û gotarên serwer

● Berxwedana li dijî guherînê

Di sinifa li başûrê Londonê de tesîra çalakgeriya siyasî zêde bû. Çavdêriyên min û notên min ên li jêr wê vê çêtir îfade bike û her wiha nîşan bide kîjan ziman di dersê de herî zêde dihatin bikaranîn.

"Di sinifê de [...] ez Tirkî û hinekî Ingilîzî dibihîsim... Pîrraniya axaftinan li ser siyaseta li Tirkiyeyê ye. Weke ku her kes hev pirr bas nas dîke li vir. Pîrraniya şagirtan jinên ciwan ên baş perwerdebûyî yê di 30 saliya xwe de ne û azîb in. [...] Ders bi çavle-

Ingilîzî dipeyivîn.

Ev sinifa hanê bi min gelekî guhertî xuya bû, ji ber ku Kurdên ji Îran, Iraq û Sûrîyê hebûn di sinifê de û mamoste li wir jî Tirkî bêhtir meyldar e bi Ingilîzî bipeyive. Herçî şagirt in, bi pîrranî deûbavên zarokên wan diçin Dibistana Yekşemê [li KCC dersên Ingilîzî, Fen û Kurdî jî bo zarokan dihatin organizekirin; têbîniya wergêr] ne.

(2 Kanûna 2012 an, têbîniya lêkolîner, sinifa li rojhilatê Londonê)

Şagirtên sinifa li rojhilatê Londonê, bi pîrranî deûbavên zarokên diçin Dibistana Yekşemê bûn. Muhim e li vir ez bibêjim, rewşêke duzîmanî di navbera deûbav û zarokan de hebû û vê rewşê kiribû ku sinifa li rojhilatê Londonê bê damezrandin. Yanî, zarok hînî Kurmanciya standart dibûn, lê hin deûbav bi Kurmanciyên herêmi dipeyivîn û hin deûbav Soranîxêv bûn û wan hiç bi Kurmancî nedizanî. Finansmana vê dibistanê jî meclîsa şaredariyê ya deverê dihat û destpêkê sinifa li başûrê Londonê jî bo zarokan hatibû damezrandin. Bi her halî, bi demê re jî bo deûbavên jî sinifek hat organizekirin. Bi zarokên wan re di heman demê de, deûbav jî ketin dersê, lê li dersgehên cihê. Gava ku finansman hat rawestandin, van sinifan salekê dewam kir û sala piştî nekarî dewam bikin.

Ji ber ku eyarên ziman û siyasî yê li her du navendan ne weke hev bûn, bikaranîna zimên û peywendî înteraksiyonê tê de çêdibû jî diguherî. Bi her halî beşdarên her du peywendan jî bi înteraksiyon û danûstendinên xwe îdeolojiyên dişibin hev ên



● **Berxwedana di nava sinifê de nişan da ka nasname çawa bi diskursan tîn avakirin û muzakerekirin, û ji ber vê jî ew ne homojen û statîk in. Peywenda sinifê jî nişan dide ka çawa fikra "standard" jî di peywenda hînbûna Kurmanciyê de tê muzakerekirin û serweriya "standard"ê çawa ji nû ve tê hilberîn.**

zimên ava kirin: Kurmanciya Mereşê di herdu peyvandan de jî hat nerewakirin.

Avakirina gotarên li ser cihêkirinên lînguîstîk û serwerî

Zimanê ku dersê dixwest hîn bike Kurmanciya "baş" yan jî "akademîk" bû. Beşdarên ev Kurmancî bi ya Bohtanê re elaqedar dikir. Ev îdeoloji xwe dide der gava jineke Elewî ya baş perwerdebûyî Elif ku bi Kurmanciya Mereşê dipeyve, (Meletî bajarekî nêzî Mereşê ye û axêverên jî vî bajarî jî weke Kurmancîxêvên ji Mereşê tîn sinifandin), dibêje, jineke ji ba şûrrojaya [Behsa Bakurê Kurdistanê dîke; tîbîniya wergêr] (herêmeke ku teqrîben Botan e)* şîret lê kiriyê da ku bi Kurmancî nepeyve, ji ber ku Kurmancîya wê çor e û zehmet e bê fêmkirin.

Ev mînak Elifê delîla neewlebûna lînguîstîk a Kurdên ji Meletiyê û Mereşê ye, ev dibe ku encama şiroveyên bi pêşhukm ên beramberî vê devokê bin. Şiroveyên jê re dikin, dibêjin bila ew "bêdeng" be, li şûna ku ew ê bi devoka xwe bipeyve, bila ew bi Tirkî bipeyve. Di hevpeyvîna me de Elif jî min re got, Kurdiya wan herêman [Diyarbakir, Çewlik û Mûş] Kurdiya "baş" e. Elif Kurdiya Mereşê û derdora wê weke di warê gramatikê de ne rast, û peyvên wê kêmtir terfî dîke. Ji gotinên Elifê em bi pêvajoya îkonizasyonê dibînin ku xisletên zimanî elaqedarî îmajên civakî ne. Ew dengê /a/ bi xelkê Mereşê re tîkildar dîke û dengê /æ/ jî bi yên din re. Îmaja civakî ya Elifê pê axaftvanên Bohtan [li vir ev peyv jî bo giştîkirinê hatiye bikaranîn, ne ku bi rastî axaftvanên Bohtanê; tîbîniya wergêr] weke di Kurmanciyê de "rewan" terfî dîke, ji bo wê, peyvên axaftvanên Kurmanciyê yên ji Mereşê kêmtir in û ew Tirkî bi kar tînin. Bi ya wê dengên weke [] yên ku xelkê Mereşê bi kar tîne jî "hişk" in.

Elif hem xwe li nav karê hilberîna îdeolojiyên serwer dixwe, bi wê yekê ku Kurmanciya Bohtanê weke "baş" bi cih dîke û îşaret bi ne"rast"bûna Kurmanciya Mereşê dîke. Hem jî ew di heman demê de bîrewerîya xwe ya metalînguîstîk a elaqedarî rêzîman û bilêvkirinê jî derdixwe pêş.

Asta duyê ya cihêkirina zimanî ya ku di peyvên Elifê de xwe dide der lêvegera fraktal e; ev hê avakirina dubendiyên nû yên elaqedarî rêzîman û bilêvkirinê herdu şeweyên zimanî ye, û pê dewamkirina îxtîlafahekinê din e. Di liberhevgerîna wê de gava wê /æ/ ya nerm û / / ya hişk de, wê / / sê caran li ser hev got, da ku min qaneh bike ku haya wê ji qaîdeyên rêzîmanê heye û ew dizane ku Kurmanciya wê ne "munasib" e. Elif wekî din dibêje, ew bi vî dizane jî ber ku ew beşdarî dersan bûye. Ev mihum e, ji ber ku ew nişan dide ka çawa ji peywenda sazûmanî dide der ka kî axaftvanekî rewî û kî ne yê rewî ye. Eyarên sazûmanî yên li sinifê alîkar dibin ji bo rewabûna Kurmanciya Bohtanê zexmtir bibe û ew jî

dibe sedema pêvajoya dubendkirinê ku di peyvên Elifê de jî hatiye avakirin.

Muzakerekirina cihêtiyên zimanî û serwerî

Mijareke din a di sinifan de ew bû ku Kurmancîxêvên ji Mereşê Tirkî û Kurdî "têkilhev dikin". Fikra tîkîlhevkirina Tirkî û Kurdî hisên tîkîlhev beramberî gotara serwer diafirînin. Di sinifa li rojhilatê Londonê, mamoste Mikail dersekê dide şagirtan, wî li rêza yekê 5 ta 6 peyvên destpêkê bi Kurdî nivîsîne, lê lêker bi Tirkî. Ji şagirtan Yeter, dikare weke Kurmancîxêv a prototîpîk a jî Mereşê bê terfîkirin. Ew, yek jî şagirtên kêmtir başperwerdebûyî ye. Ev dikare yek jî sedeman ka çima bêhtir bi wê hat kenin. Piştî ku Mikail ew metîna bi mubalexe behsa Kurmanciya Mereşê dikir, xwend, Yeter got, ev tam weke Kurdiya "wê" bûye. Li aliyekî Yeter dibîne ku "têkilhevkirina" Tirkî û Kurdî bi wê nexerib e. Li aliyê din jî ew metelmayî ye ji ber ku bi gotinên wê, "ev hemû Tirkî ye". Sedema metelmayîna wê peywenda sinifê ye; lewma eyara sinifê ew e ku lê Kurmanciya "rast" hîn dibe û ne li bendê bû ku mamoste Tirkî û Kurdî "têkel hev bike". Wekî din Yeter li ber xwe dide û dibêje, ev awayê ew dipeyve. Lê di heman demê de ew îdeolojiya serwer a ku dibêje Kurmanciya Mereşê bi awayekî "xwezayî" tîkelhev e. Ev danûstandina Yeterê bi Miakîl re îkonizasyonê Kurmanciyê Mereşê weke "têkelhev" nişan dide. Lê ew ne ku tenê vê qebûl dîke, ew her wiha li ber xwe dide, îsradîke ku Kurmanciya xwe bi kar bîne û pê nasnameya xwe ya herêmi diparêze.

Berxwedan

Peywenda sinifê wekî din derfetê dide şagirtan ku îdeolojiyên zimên ên ku mamoste û peywenda hînbûna Kurmanciya standart li ser wan ferz dîke, muzakere bikin û li dijî wan li ber xwe bidin. Kurmancîxêvên Mereşê bi îndeksîkirina nasnameya xwe û otantîkbûna varyanta xwe li ber gotarên serwer ên ku pê rewabûna Kurmanciya Bohtanê cîbicî bûye. Danûstandina di navbera Yeter, Gulbahar, Kamuran û mamoste Mikail a li sinifa li rojhilatê Londonê de minakeke baş e. Li vir bi Yeterê dîkeniyan. Cihêtiyên herêmi yên weke 'dîlizim' û 'dalizim' (Kurmanciya Mereşê), yan jî tîkelhevkirina morfemên Kurdî û Tirkî yên weke 'yozmişke' dibûn sedem ku gelekî bi wê bê kenin, nexasîm jî ewên bêhtir perwerdebûyî û ne ji herêma wê bi wê dîkeniyan.

Mamosteyê Yeterê gelek caran Kurmanciya Yeterê rast dikir û îsradîke ku ew dengên weke "da", ber bi "di" ve biguherîne; lê carinan jî wî dev jî ber dida û îsradîke ku Yeter nişanên devoka xwe biguherîne. Gelek caran aloziyên bi vî rengî bi wê yekê dihatin çareserîkirin ku mamoste digot, ev tenê cihêtiyên herêmi ne û şagirt dikarin kîjan varyantê dixwazin wê bi kar binin. Tevî ku armanca Mi-

kail hînkirina Kurmanciya standart bûye, ji ber berxwedana şagirtan carinan ew neçar maye qebûl bike ku beramberî Kurmanciya Mereşê "xweşbin" be.

Herç peyv in, Mikail ew qebûl dikin, lê jî bo xisletên dengsaziyê yên yeterê wî alternatîf pêşniyaz dikirin. Yanî Mikail neçar bû ku hêmanên "bi pîrsîgîrêk" ên di varyanta Yeterê de di warê veguherîna deng de muzakere bike. Berxwedana Yeterê beramberê vê veguherîna dengî elaqedarî pêvajoya avabûna nasnameyê ye. Yeter repertuwarê xwe zimanî ya cihê jî bo avakirina nasnameya xwe ya herêmi bi kar tîne û ew li dijî guhertina nişanên devoka xwe li ber xwe dide bi wê yekê ku ew girêdana xwe ya herêmi bi bîrewerîya xwe ya metalînguîstîk bi gotinê weke "Em wa dabên" derdixwe pêş.

Berxwedana di nava sinifê de nişan da ka nasname çawa bi diskursan tîn avakirin û muzakerekirin, û ji ber vê jî ew ne homojen û statîk in. Peywenda sinifê jî nişan dide ka çawa fikra "standard" jî di peywenda hînbûna Kurmanciyê de tê muzakerekirin û serweriya "standard"ê çawa ji nû ve tê hilberîn.

Çavkanî

Bakhtin, M.M. 1981. *Dialogic imagination: Four Essays*. Michael Holquist Ed. Caryl Emerson & Michael Holquist (Trans). Austin: University of Texas Press Slavic Series.

Copland, Fiona & Angela Creese. 2015. *Linguistic ethnography: Collecting, analysing and presenting data*. London: SAGE Publications Ltd.

Creese, Angela. 2008. *Linguistic ethnography*. In K. A. King & N. H. Hornberger (eds.), *Encyclopedia of language and education*, 2nd edn, vol. 10 (Research methods in language and education), 229–241. New York: Springer.

Özhan & Abdurrahman Kardaş. 2015. *Kurdî Kurmancî 5. Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları*.

Gülmez, Gülbeddin, Hasan Gümüç, Ahmet Eyer, Ramazan Yaman, Lokman Kartal, Abdurrahman Özhan & Abdurrahman Kardaş. 2017. *Kurdî Kurmancî 5. Türkiye Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları*.

Hudson, R.A. 1996. *Sociolinguistics*, 2nd edn. Cambridge: Cambridge University Press.

Irvine, Judith T. & Susan Gal. 2000. *Language ideology and linguistic differentiation*. In P.V.

Lippi Green, R. 1994. *Accent, standard language ideology, and discriminatory pretext in the courts*. *Language in Society* 23. 163–198.

Piller, Ingrid. 2015. *Language ideologies*. In K. Tracy, C. Lile & T. Sandel (eds.), *The international encyclopedia of language and social interaction*, vol. 2, 917–927. (The Wiley Blackwell-ICA international encyclopedias of communication). West Sussex: Wiley-Blackwell Publishing.

Silverstein, Michael. 2003. *WP 121 Michael Silverstein in conversation: Translatability and the uses of standardisation*. Silverstein 2013 interviewed by Blommaert & Van der Aa. *Skutnabb-Kangas, T.* 2010. *Crimes against humanity in education, and applied linguistics – corporate globalisation or geopolitical knowledge globalisation?* In: *Plenary at BAAL 9-11 September 2010, Aberdeen, Scotland*.

Yıldırım, Kadri, Abdurrahman Adak, Hayrullah Acar & Zulkuf Pertev Ramazan Eğin. 2015. *Kurdî 5. Türkiye Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları*.

Yilmaz, Birgül. 2016. *Learning "my" language: Moments of languages and identities among Kurds in the UK*. Unpublished PhD Thesis. SOAS, University of London.

Wergera jî Ingilîzî: Luqman GULDIVÊ

* Nivîskar li vir şayîyekê dîke, lê mirov dikare wisa qebûl bike ku şagirt gava dibêjin başûrojilat û gava dibêjin Bohtan jî ne Bohtanê li heman devera Kurmancîxêvê pê terfî dikin ku ew bi Kurmanciya standart re weke hev dibînin; tîbîniya wergêr.

Eytanê

► Nûcihan HEZA

-Keça min ka wan şimikên limêjê bide dest min.

Dengê wê nizm bû, heçku ji xwe re diştexilî. Bi vê gotinê re jinikê devlingê kirasê xwe hinekî dî bi hewa xist. Her du kevîkên çarika xwe ya spî xiste piştê gûhê xwe. Ji bêvila wê û ji hinarokên wê ya sorik dilopên avê diherikîn; bi destê xwe yê rastê ava li ser wechê xwe paqij kir. Serê xwe ji ber deriyê hemamê, ber bi odeyê ve dirêj kir;

-Eytanê, wa Eytanê!

Dengê wê hinekî dî bilintir bûbû. Ji metbexê dengê xirexirekê hate guhê wê, lê pêjna kesî nehat.

-Estaxfirulla, estaxfirulla... Rebbê alemê hefza me ji ya mezintir bike.

Di ber xwe de, fena minminekê çend gotinên wilo kirin. Dît ku pora wê di ber çarîkê re derketiye. Çarîka xwe jê kir û kevîka çarîka xwe kire devê xwe. Lastîka xwe ya spîçolkî ku li ser pora wê jidandî, bi destê xwe yê rastê derxist. Pora xwe ya ji nivî bêhtir spî (Xwedê dizane ku ji mêj ve hene nekeribû) bi her du destan li ber qemçîka xwe kom kir; ew lastîka xwe ya spîçolkî dîsa li pora xwe bada û çarîka xwe li serê xwe pêça.

Vê carê bi dengêkî hê bilintir bang kir;

-Keçê Eytanê, lawo ez li hêviya te me. Hey la agir bi dijminê te ketê! Hema carê ji ber xwe ve bîra tiştan bibin. Ma qey her gavê em ê şîretan li we bikin.

Hê xebere wê di devê wê de, dengêkî ziravok û melûl ji metbexê hat;

-Va hatim yadêpirê. Xaltîka Fatîmayê beroşa me ya bafûnî xwestibû, gote ez ê mehîrê çêkim, min ew dayê.

-Ê de bera be. De ka lawo, de ka bilezêne..

Hê wilo, di destê wê de tevî cohtek şimikê şinik û lastîkî ber bi hamamê ve hat Eytanê. Di bin etekê wê yê qehweyî de ku heta bi gwîzeka wê xwe dîberda, bêcemeyê wê yê pewayî xuya dikir. Her du milên xwe ber bi pêşiya xwe ve qof kiribûn. Di bin fanêreyê wê yê peneyî, xemrî û fireh de singê wê weke du xarîkan hema hema xuya dikirin. Kezîka wê ya reş ku xweşik hatibû hunandin, ji ser milê wê yê çepê ber bi jêr ve xwe berdabû. Lêvên wê yên ziravok terikibûn, sor dikirin. Sê çar pîrîz li êniya wê xuya dikirin, yek jê ji bi xwîni bûbû. Çavikên wê yên hûrik û qehweyî melûl melûl bûn. Bi carekê xwe tewand ku şimikên limêje deynê ber lingê yadêpîra xwe;

-Ha va ye yadêpîrê!

Yadêpîrê lingên xwe yên şil, dikir ku tîxe şimikan;

-Ma keçka min, hewce ye ku ez her çar bêjim te? Hema carê ku te dît ez destilmêj digirim, bê çîpûçîp û here şimikên min bêne devê derî. Yadê qubanê, ma ne tu êdî ne biçûkî; tu kamil î.

Keçikê dengê xwe nekîr, ti tişt negot, mehdê xwe ji tîrs nekîr; hema wilo bê his û bê deng li pîrika xwe guhdarî dikir. Na na, guhdarî nedikir, hew li nav çavê pîrika xwe dimeyazand. Pîrika wê çîma her gav heman tişt digotin?

Heta ku pîrika wê gotinên xwe qedandin, ew jî çû wê odeya ku somya lê.

Wexta ku bi hêdîka çû ser somyayê, hema zîqzîqek ji textixên wê hat. Heta ku her du kabokên xwe ber bi zîkê xwe ve kişandin, her du çengên xwe li dora kabokên xwe zivirandin û serê xwe danî ser kabokên xwe, dengê zîqzîqê dewam kir. Berê xwe da ber şibakeyê.



► Çar pênc caran li hawîrdora xwe meyzand tivilkê, serê wê bi kijan alî ve diçû hema sûkra wê jî bi pê re dizivîrî. Ji nişka ve, weke ku tirsahabe kire firrîn û çû. Dengê firrîna wê hate guhê Eytanê.

Şibakeyek girtî bû, yek jê li piştê vekiribû û perdeyeke spî li pişt şibakaya vekirî kom kiribû. Di şibakeya vekirî re çavê wê li dara gwîzê ket. Dengê wîçewîça çûkekê jî dihat; dibe ku ne çûkek be, du an jî sê...

Çavê xwe li gwîzan gerand, qaşûlên wan hê jî şin bûn. Gwîzeke cewî hate ber çavê wê, bişîrî. Wexta ku zaro bûn, ew gwîzên ku du an sê bi hev ve bûn ji wan re digotin 'Gwîzên cewî'. Çîqa kêfa wan dihat, wexta ku gwîzên cewî diditin. Nexasim wexta ku sê gwîzên bi hev ve diditin ji eşqa difirîn, ew û hevala xwe Esmakê. Lê êdî ne zaro bûn; pîrika wê wilo digot. Bi carekê dengê pispista pîrika wê hate guhê wê;

-Siphanalla, siphanalla, siphanallah. Rebbil 'ezîm.

"Xwezî nihakê ez ne di sinifa 7'an de bûma; me yê xeta bilîstana bî Esmakê re" digot di dilê xwe de Eytanê. Lê na, nabe. Ma ne pîrika wê digot, tu êdî kamil bûyî. Heke li derve bilîsta yê xelkê bigota bavê wê nîne, li derve ewartiyane dike. Dîsa pispista pîrika wê hate guhê wê;

-La illaha illallah, Muhammed Resurullah. Estaxfirulla estaxfirulla...

Tiştêkî, xwe li cama wê şibakaya girtî xist, hema hema dengê wê hat. Eytanê berê xwe da aliyê şibakeya girtî. Tivilkê... Tivilkeke reşik. Na, ne tenê reş; dûvikê wê spî. Çar pênc caran li hawîrdora xwe meyzand tivilkê, serê wê bi kijan alî ve diçû hema sûkra wê jî bi pê re dizivîrî. Ji nişka ve, weke ku tirsahabe kire firrîn û çû. Dengê firrîna wê hate guhê Eytanê. Qederekê, hema wilo çavên wê li dû tivilkê man. Piştê dîsa çavê wê çûn ser dara gwîzê; lê şewqa tavikê li ser darê çûbû. Wîçewîça çûkan, belkî jî çûkê, firk bûbû. "Xwezî nihakê di sinifa 5'an de bûma; ez ê çûbana serê dara gwîzê" ji xwe re digot Eytanê. Lê na, nabe. Ma ne pîrika wê digot, heke ji darê bikeve yê keçkaniya wê ji xera bibe. Yê xelkê ji bigota bavê wê nîne û nizam çî... Ma qey keçikên kamilbûyî qet diçin ser darê? Na!

-Ya rebbê 'alemê, tu hefza me ji neqancan bike, tu me neke direka bêbavan, bêbextan. Ya rebbî tu me hefz bike...

Bi dengê pîrika xwe, ji cihê xwe hindikî lebitîbû Eytanê. Lê dîsa jî serê wê li ser kabokên wê bû. Dizanî hê diayên wê neqediyanne, hê jê re heye. Na na, ne diayên xwe; hewarên xwe. Ma ne pîrika wê digot, diayên kezbeşewitîyan nînin, hewarên wan hene.

-Hewara min li te ye ya Xwedayê mino, bi xatirê

peyxemberê Resûlullah, ehlê Xwedê! Tu ji sersebeban re nehêlê, xwîna çavreşê min li erdê nemêne. Ya Şêx Evdilaqadirê Geylanî, ya Xoceyê Xizir, herin ricayê ji Xwedayê min re ku heqê me li dijminê bavê Eytanka min nemêne. Waa Eytanê! Keçê lawo, bavê te pêlawan bû, çawa wan şîrheraman ew kirin bin erdê?

Dengê pîrika wê kelogirî bûbû.

-Ew bejna bilind xistin bin axa sar. Ax sar... Ew çavên reş wenda bûn keçê Eytanê! Ya Xwedayê mino, ya Rebbê 'alemê tu dengê hewara min bike, tu heqê me ji zaliman re nehêlê.

Dengê giriyê pîrika xwe bihîst Eytanê, weke wan rojên dî. Ew ji cihê xwe nelebitîbû, hê jî serê wê li ser kabokên wê, çavên wê li dara gwîzê. Carekê weke pîstepîstekê jî devê wê pekî;

-Bes, bess...

-Ma çî suncê berxê min hebû? Ya Xwedayê mezin, tu dengê hewara min bike, heqê me nehêlê, çawa ku kezaba min şewitî tu kezaba wan ji bişewitêne. Negî-hijta miradê xwe berxê diya xwe. Keçê waa Eytanê, lawo bavê te pêlawan bû, nestêleh bû! Ya Resûlê Ekrem here hewara min, bera xwîna berxê min li erdê nemêne.

Çavên Eytanê li dara gwîzê, serê wê li ser kabokên wê. Wilo hêdî hêdî dihejand serê xwe. Di neqeba lêvên wê yên terikî de pîstepîstêke hûrik hebû, weke hilmeke ku hema bêj nedihat bihîstîn;

-Bes, bes, bes, bess...

Dengê pîrika wê qut bû. Bayekî nermik xwe li wechê wê xist, biska wê ya reş û dirêj hat ser çavê wê; lê neediland. Çembilê şibakeyê hêdîka li diwêr ket, dengê wê kir. Bayekî di xwe li bedana wê pêça, wek ku hinkayiyek his kir. Lerizî..

-Bess...

Serê wê li ser kabokên wê, çavên wê li dara gwîzê. Bawerzînekê bêhna dara gwîzê ani ber bêvila wê; bêhn kir, bêhn kir... Keserek berda, bêyî ku zanibe keser çî ye.

.....

-Ya rebbî hezar bar şikir ji te re... Eytanê, rabe lawo rab! De ka em kara şîva xwe bikin.

Dengê pîrika wê ne bi girî bû, ne jî bi kelogirî; ne bi lind bû ne jî nizm bû. Hew zelal bû. Tu dibê qey, ew dengê wê yê hewarî wenda bûbû.

Ma gelo hewarên wê gihiştin Xwedê?

Helbest stran e stran helbest e

► Car heye ji bo wê helbest stran e, stran helbest e û di hemû şereş û reşetariyan de bi hawariya wê ve tên û coş û peroşiyê kolektîv peyda dikin. Yek ji vê coşa kolektîv a muzîk û helbestê jî albûma "Tov" a Rewşanê ye.

Heger meriv rabe û flam, dirûvekî bi hunerê bixe û tiştê bibêje; bi hawakî struktural kewareke mêşan e. Her malikeke vê kewarê jî şaxekî wê temsîl dike. Gava malikek ji hilweşe, kêm bibe an jî bişikê, tu bikî nekî tesirê li tevahiya kewarê dike. Dibe ku her malikek xwedî xweseriyekê be, lê li gor pêçûn û xwendina min axirê bi hawakî tên li heman kewarê dilûsin. Tiştê ji wan hasil dibe jî, tiştê kolektîv e.

Lewma meriv dikare bêje, huner tev jî kaniya hev vedixwin û dixwazin deng, reng û teamên jiyane di xwe de bihewinin. Wekî hemû huneran, muzîk jî ji kaniya gelek huneran vedixwe. Pîrî caran xwe li neqebeke di navbera peyv û risteyê de datîne. Nexasim muzîka bipeyv, bi ku ve biçê jî axirê li tingîniya dangan û melodiya xweser a risteyan datîne. Wekî gorbuhîşt Arjen Arî jî gotî, peyv ji bo her muzîkê serkanî ye û muzîk bi amûran govendê li dû û dora peyvê digerin. Bi vê govendgerîne jî dike ku heqîqeteke hevpar a ruhi, coşeke kolektîv aj bide.

Huner weke meydana xilasiyê

Helbet ev pêwendî û kolektîvbûyîna di navbera muzîk û peyvê de, xwe di sîpêre dîrokeke qedim ku gelek kesan ji pencereyên çihê bi lêv kirine. Wekî xwedawerivandinê, qetandina zincîran, hayjixwehebûnê, armonyekê... şirove kirine. Ji bo civak û ferd bi darî hev kevin û hay ji rewşa maddî û arîşî ya heyî çê bibin, barekî katartîk (pakbûn, dawerivîn) û ontolojîk li muzîk û peyv-helbestê bar kirine.

Yek ji ehlê vê pêwendiyê rast jî Nietzsche ye. Li gor wî, divê ev pêwendî rast bê danîn.

Çimkî, bêyî hunerê ne mimkun e mirov ji weziyeta "mîrovê trajîk" ber bi weziyeta "mîrovê bilind" ve biçê û ne mumkin e, behsa civakane bike.

Heger mumkin be jî wê navê vê vedekirin an jî tecrid be. Ew civak wê civakine çolax û kulek bin. Lewma bivênevêya civakbûnê ye. Xasma jî gava mirov bi siyaseta, politîka, zanîst û wekî din nikarin nêzikayîtdana xwe ya ji bo xwezayê tehlîl bikin, nikarin ruhê xwe têr bikin û dixitimin, yekser berê xwe didin hunerê. Ji lewre, xelasiya civaka ku di warê aqil, exlaq û heqîqetê de tê rûxandin û ketibe nav çiravekê, bi taybetî bi hunerine wekî muzîk û helbestê pêkan e. Loma li ber tirs û felaketa hebûniyê, hunerê wekî rizgarê jiyane û helbestkar/hu-



nermend jî wekî dengdanê li kendal û hevrazên hebûnê pênasê dike.

Coşa kolektîf û Tov

Ûjar di heyamekê de ku ruhê mirovan tê kolekirin, nasname û estetîka mirovan tê qijilandin, carinan jî her wextî bêhtir pêdivî bi têkilî û pêwendiyê wisa çê dibe. Car heye, ew coş û hêza ku melodiyek, peyvek an jî ristek li hev bar kirine, dibe sedema bêhnberdan û bêhnedaneke mezin. Mîrov bi saya vê çirûskê dikare bi ser hemdê xwe ve bê. Yanî ew ruhê mirov yê zor û tehdê lê hatiye kirin û tengjiyê, çavan dide xwe û jî wê weziyeta heyî ber bi rewşeke xurt ve şiyar dibe. Dibe destgirê jiyane. Dike ku mirov careke din li tiştê der barê dîrok û çîhanê de şiyar bibe, di parzûna xwe re biparzinîne. Dike ku rê li ber azadiya xwe ya hundirîn veke û di tarîtiyê de bibe çûkê Mînerwayê û di wêşê şoreşê de li rastiyeke deyne.


Belkî jî ev pênasê, herî pir li civaka Kurdî tê ku li dijî qirkirina çandî, muzîk û helbestê kozîkên wê yî nayê têkşikandin û jî heqîqetên wê yî sereke ne. Car heye jî bo wê helbest stran e, stran helbest e û di hemû şereş û reşetariyan de bi hawara wê ve

tên û coş û peroşiyê kolektîv peyda dikin. Yek ji vê coşa kolektîv a muzîk û helbestê jî albûma "Tov" a Rewşanê ye.

"Tov", bi sewta xwe careke din nişan dide, bê muzîk di navbera edebiyat û helbestê de xwe li neqebeke çawa û qewî datîne. Nexasim jî bi stranên bi navê "Dinya Ha Ye", "Wisa Dixwazim" û "Gulîzera min" ku her sê jî helbestên Fêrikê Üsiv in, bê çawa peyv-helbest serkaniya muzîkê ye, bê çawa muzîk bi amûran govendê li dû û dora peyvê digerin, bê çawa gava peyv-helbest û muzîk li sewtekê dibin yekpare û hêzeke çawa diafirînin, bê çawa coşeke kolektîv diafirînin, bê ruhekî çilo li mirov hasil dikin, bê çawa ji bo ew ruhê mirov yê zor û tehdê lê hatiye kirin û tê xwestin li qeyd û kelemçeyan bê xistin, dibin havên, bê çawa di hundir de hêla insanî şiyar dikin, bê çawa wê jiyana heywanî red dikin, bê li ber qijilandin û kolekirina nasnameya ruhi û estetîkî rabûneke çawa peyde dikin...



Rêdûr DÛLE



FÊRIKÊ ÜSIV

Ba le te nemîni

...
Bê, hatim çûm ber derê we de
Te bîjna zirav ray min neda
Ba le te nemîni
Dê tu xwar be, /ê be ser min de
Ev çî hall ku em tê da

(Kasim Durmuş ê ji Harûnan)

